



Danerê Rojnameya pêşî ya
Kurdi Miqdad Mîthed Bedirxan

Armanc

Rojnameya Mehane

Hejmar, No: 141

Tebax
August 1993

Buha - Price
15 SKR, 3 DM

Dîgor, Malazgîrt, Gever...

Armancên êrîşên nuh

◆ Dewletê roja 14-15 Tebaxê li Melazgîrtê, Dîgorê xelk gulebaran kir. Bi dehan kes kuştin, bi sedan kes jî birîndar kirin.

◆ Ji bo çavtirsandinê û prova qet-

lîamên mezin, bajarên Kurdistanê tîr gulebarankirin. Di vê meha dawîn de dewletê Hezo, Çelê û Gever du caran bi seetan dan ber top û guleyan.



Ji terora hêzên dewletê bi piranî jin û zarok "nesîbê xwe" digrin

Roja 14'ê Tebaxê li ser banga PKK'ê xelkên gundiyên der û dora Dîgorê ku qeza Qersê ye, meşiya. Li dor 4000 meşvanî dema xwestin bikevin nav Dîgorê, hêzên dewletê pêşî li wan girt û ew gulebaran kirin.

Li gor beyanên resmî 10 kes hatin kuştin, 24 kes jî hatin birîndar kirin. Li gor heyeta DEP'ê (Partiya Demokrasiyê) ku piştî bûyerê çû herêmê, 16 kes hatine kuştin, 114 kes jî hatine birîndar kirin. Heyeta DEP'ê rûdana bûyerê weha da diyarkirin:

"Meşa ku ji gundan ber bi merkeza Dîgorê pêk hat, bi xwestina PKK'ê çêbû. Lê vajiya beyanên resmî, ji nav koma meşvanan teqîn çênebûye. Di navbera PKK'ê û hêzên dewletê de tu şer derneketiye. Hêzên taybetî (yên dewletê) yekalî koma meşvanan dane ber guleyan. Heger qetlîam hîn mezintir nebûbe, sedem, helwest û însiyatîfa însanî ya qey-meqamê Dîgorê bûye".

Rojek piştî qetlîama Dîgorê, li Melazgîrtê jî bûyerek rû da. Gundiyên der û dora Melazgîrtê ber bi merkeza Melazgîrtê meşiya. Hêzên dewletê ew dan ber guleyan. Li gor beyanên resmî 4 kes hatin kuştin û bi dehan kes hatin birîndar kirin. Di her du bûyeran da jî kesên hatin kuştin piranî jin û zarok in.

Ji serê salê û vir ve ye ku

dewlet metodeke nuh ya terorê bi kar tîne. Li bajarên ku welatparêz lê xurt in, dewlet bi şevê bajêr hemû bi seetan dide ber guleyan. Bi vî awayê terorê, dewlet dixwaze bighêje van encaman: 1- Çavtirsandin. Yanî dixwaze bi-bêje; "Dema ez bixwazim, dikarin bi vî awayî bajêr bi ser serê we de hilweşînim". 2- Bi zerara maddî, dixwaze hîn bêtir xelkê bêzar bike. 3- Ya herî girîng, xelkê mecbûrî koçkirinê bike, nufûsa herêmê daxîne.


Bi van armancan dewletê jî serê salê vir ve Şîrnex, Cizîr, Dêrik, Pasûr, Licê, Hezro û gelek ciyên din da ber top û guleyan. Di vê meha dawîn de Hezo (Kozluk), Çelê (Çukurca) û du car jî Gever (Yuksekov) gulebaran kir.

Her carê mirov tîr kuştin, birîndar dibin, bi sedan xanî, dikan, oto xesar dibînin.

Li gor agahdariyan di êrîşa dawîn ya Geverê de 4 kes birîndar bûn, xesarek mezin li bajêr çêbû. Li gor agahdariya serokê belediya Geverê Nejat Buldan, gelek kesan dest bi koçê kirine. Herweha di êrîşa Çelê de jinek hemil ku navê wê Cinet Ertunç bû, mir, 8 kes jî birîndar bûn. Leşkeran hemû peyayên Çelê civandin û birin.

Ji xwe gund wêran kirin, şewitandin, talankirin her berde-wam in. Roj tune ye gundekî nuh neyê valakirin. Heger barbariya dewleta Tirk bi vî tempoyê devam bike, di demekî ne dûr de wê

Dûmahîk: r.11



Kê ji kê xwar!

Êrîşên dewletê li ser çapemeniya Kurdi

Piştî doza girtina rojname Ozgur Gundemê, Aydinlik û kovara Dengê Sawciyê Mahkema Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê Unal Erden dawa vekir ku rojname Medya Guneşî jî bigre.

Dewleta Tirk bi her hawî li dijî gelê Kurd şerekî dirindane dajo. Her roj bi dehan kes ji aliyê hêzên dewletê yên tarî ve tîr kuştin. Lûleyên çekên hêzên dewletê berî her tiştî li dijî wan kesan in yên ku di herêma xwe de xelk ji wan hes dike. Ev kes berî her tiştî rojnamevan in û kesên welatparêz in. Di 8'ê Tebaxê de nûçegîhanê Ozgur Gundemê yê Bedlîsê Ferhat Tepe bi barbarî hat kuştin. Bi kuştina Ferhat Tepe hejmara kuştina muhabîrên rojnameya Ozgur Gundemê gihîşt dehan. Nûçegîhana Ozgur Gundemê Aysel Malkaç jî wenda ye û heta rojname me ket çapê ji xeber jê nehatibû stendin.

Dewleta Tirkîyê li dijî şerê gelê Kurd hemû çapemeniya Tirkîyê seberber kiriye. Genaralên Ordîyê bi berpirsiyarên rojnamên rojane yên Tirkîyê re civînan çêdikin ku ew "rastîyê" nenivîsin. Yên ku rastîya Kurdan dinivîsin û êrîşên dewleta Tirkîyê rûreş dikin, tîr civandin û qedexekirin.

Rojname û kovarên Kurdan



hemû di bin êrîşên dewletê de ne. Hema bêje hemû hejmarên Medya Guneşî, Azadî, Ozgur Gundem, Newroz, Deng û Newroz Ateşî tîr topkîrîn û qedexa kirin. Berpirsiyarê Medya Guneşî Mahmûd Metîn û yê Ozgur Gundemê Davûd Karadax di zîndanê de ne. Bi milyonan pere û bi sed salan cezayê hefsê ji berpirsiyarên rojname û kovarên Kurdan re tîr xwestin.

Êdî dewlet tenê bi civandin û belavkirina rojname û kovarên Kurdan "qîma" xwe nayne. Ew bi biryarên mahkemê wan dide girtin jî. Piştî doza girtina rojname Ozgur Gundemê, Aydinlik û kovara Dengê Sawciyê Mahkema Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê Unal Erden dawa vekir ku rojname Medya Guneşî jî bigre. Sawciyê mahkema Stenbolê sebaba girtinê Medya Guneşî nivîsa Medya Guneşî ya hejmara 31'an de "Bûyara Bingolê destpêka ya ji dawiyê" nişan dide.

Heşen Mizgîn
"Iro avakirina cepheyekê ne rast e"
rûpel 3

M. Xelîl:
"Divê rê ji çareyan re vebin"
Rûpel: 4

Celîlê Celîl:
Du destnivîsên Ebdurrezaq Bedirxan
Rûpel: 5

Mahmûd Lewendî:
Ala Kurdî
rûpel 6-7

Suleyman Demir:
Mayakovskî
rûpel: 9

Rojava Mehê



Tevgera Kurdî divê zûtirîn wext bi hemla rowanşekê rabe

Li gorî beyana muşterek a PSK û PKK'ê, di 30 Tebaxê de serokên herdu partiyên civiyane û li ser bûyaren dawîn ên Kurdistanê guftûgo kirine. Encamên ku herdu alî gihîştinê, ne pirr bi zelalî be jî di beyanê de xal bi xal tîr diyar kirin.

Berî her tiştî jî bilî naveroka beyanê, hevdu dîtina hêzên siyasî û serokên wan, berdewamkirina guftûgoyan diyalogên misêwa yên bi îstîqrar, nîşana pêşveçûna ber bi maf û berjewendiyên gelê Kurd e.

Di beyanê de destnîşankirina sîwdariya dewleta Tirk di berdewambûna şerê xwînî yê qirêjê de, bîr û baweriya muşterek a hemû hêzên siyasî û ya hemû Kurdan e. Lê mixabin em nikarin, ji ber çav winda bikin ku tevgera Kurdî bi ser neketiye ku wê baweriye têxe serê raya giştî ya gelê Tirk û bi taybetî ya cihanê. Herdu serok, heyfa xwe bi wê yekê tînin ku teqerawestan bi dawî hat û şer du alî careka din gurr bû. Lê ew wê yekê destnîşan nakin ku çekdarên PKK'ê bi fêlbaziyên dewleta Tirk hatin xapandin, bûn mexdûrên provakasyona dewletê. Dewletê şer ranewestand, wê her şer xwest û xwîn rijand, lê bi bûyara Bîngolê sîwê gurrkirina şerî hemî xist hustuyê PKK'ê û ev yek bi dinyayê û raya giştî ya Tirk da bawer kirin.

Hemla buharê ya teqerawestandinê û protokola muşterek a Kemal Burkay û Abdullah Ocalan, gavinî di cîhde bûn. Tesîra protokola muşterek bi gavên gelek hêdî be jî hê tê dîtin û hewa ku piştî vê protokolê di nav hêzên siyasî û raya giştî ya Kurd de belav bûye, ne bêqîmet e. Ev hewa îro îmkânê dide ku tevgera Kurdî xwe amedeyî hemleyek nuh bike û ji gerreka encamên taktîkên şaşçûyî xelas bibe.

Bi vê bawer kirinê, li Kurdistanê îro xeta şerxwaz bi çargavê li dar e, hukumeta Tirk bîhneke fireh vedaye û bi rehetî bi problemên xwe yên hundirîn mijûl dibe. Îdi raya giştî jî tu reaksiyoneke ciddî li hemberî şer nîşan nade û tesîra frênkirina karê qirêjê e hukûmetê nake. Ruşwetxwariya ISKÎ'yê bi xwe jî qat qat ji vê xwînêrîjîya dewletê pirtir di çapemeniyê de cîh digire.

Ya muhîm, di belavokê de ne diyar e ku ka wê herdu alî jî bo derçûna ji vê qonaxê encama taktîkên şaş tu muhawelê bikin yan na. Yan jî ji bo wê çî bê kirin.

Bes bi tesbîta "mixabîniyekê" tevgera Kurdî nikare ji gerrekek wiha wadîjwar rizgar bibe. Heta ji vê gerrekê neyê xelasbûn hemla rowanşekê bi deng û tesîr neyê kirin, hukûmeta Tirk wê bi bîhnfirehî û rehawetkarê xwe yê xwînêrîjîyê bidomîne.

Hemla buharê ya teqerawestandinê û protokola muşterek a Kemal Burkay û Abdullah Ocalan, gavinî di cîh de bûn. Tesîra protokola muşterek bi gavên gelek hêdî be jî hê tê dîtin û hewa ku piştî vê protokolê di nav hêzên siyasî û raya giştî ya Kurd de belav bûye, ne bêqîmet e. Ev hewa îro îmkânê dide ku tevgera Kurdî xwe amedeyî hemleyek nuh bike û ji gerreka encamên taktîkên şaşçûyî xelas bibe.

Ev şerê xwînî yê van çend mehên dawîn nîşan dide ku, eger tevgera Kurdî alternatîfeka siyasî ya baş formulekirî û konkret dernexê û şerê çekdarî neke hêz jî vê alternatîfa siyasî re, nikare xwe ji rewşa tengasiyê xelas bike û cîh li hukûmeta Tirk teng bike.

Di beyana muşterek a dawîya civîna 30'ê Tebaxê de herdu serok daxwaza teqerawestandinê û destpêkirina guftûgoyên siyasî dikin. Ev pêveçûneke rast û qenc e, lê ne bes e, divê em nexapin û raya Kurdî jî nedin xapandin ku, bi beyanek wiha û tenê bi daxwazê wê hukûmeta Tirk şer rawestîne. Na, ev nuxta herî zeîf a dewleta Tirk e. Ew jî bo çareser kirinê siyasî ne amede ye. Ji teqerawestandinê buharê jî tecrube wergirtine ku dewrek wiha çiqas bi eşkereyî rûreşî û durûtiya dewletê derdixe meydanê. Hukûmet careka din zû bi zû wê xwe nexa tengasiyek wiha.

Çare ew e ku tevgera Kurdî, bi amedebûnek plankirî, daxwazên gelek eşkere û berbiçav alternatîfeka siyasî daxê meydanê û ji her aliyê de zorê bide ku hukûmetê mecbûrî rîyeke wiha bike.

Ev jî bi dirêj kirina amedebûna ji bo avakirina cepkeyekê nabe, bi munaqeseyên dîr û dirêj û bê netîce yên li ser stratejiyên dîr û dirêj nabe. Hêzên Kurdî divê zûtirîn wext ji bo derxistina alternatîfeka siyasî ya îroyîn bighên netîce û vê yekê tîxin jiyanê.

Zinarê Xamo tiştan berevacî tédigihe !

Halim Can

Di hejmara 140'î ya rojnama Armancê de, quncikê "Stiriyên Me" de gotareke Zinarê Xamo bi navê "Uzra ji qebêhetê mezintir" çap bû. Zinarê Xamo di gotara xwe de çima ku rojnama Medya Guneşî bi seranser neşriyeta xwe bi Kurdî nake, rexne dike û li gor Zinar dinivîsîne xwedigiravî li gor nivîsekê ku di Medya Guneşî hejmar 28'an de hatiye çapkirin, "ew bi zanetî Medya Guneşî bi Kurdî demaxin".

Berê pewîst e meriv diyar bike yên ku bi Tirkî nizanin û Medya Guneşî (bi taybetî jî nivîsa ku Zinarê Xamo bahs dike) nexwendibin, dê bêjin belkî bi rastî Medya Guneşî tiştekî wilo nivîsandîye ku "ew bi zanetî Medya Guneşî bi Kurdî demaxin" û heq bidin Zinarê Xamo.

Lê rasti ne wiha ye. Carekê nivîsa ku Zinarê Xamo qala wê dike, yan Zinar bi zanetî nexwestiyê jê fehm bike û yan jî xwestiyê tenê babetekê ji "Stiriyên xwe" re bibîne. Ji aliyê din jî wî tenê hinek bendên nivîsê wergerandine Kurdî, tiştê ku xwestiyê "stiriyên xwe tê rake" derxistiyê pêş. Yanî di nav daristanê de darek tenê ditiye û li gor niyetên xwe yên subjektîf rexne lê girtiye.

Pewîstî gotinê ye ku meriv bibêje, hemû raya giştî ya Kurdan zanin ku tradîsyona ku Medya Guneşî dewama wê ye, di warê nivîsandin û weşandina zimanê Kurdî de (Kurmancî-Dimilî) li Kurdistanê bakur pêşengî kiriye û nuha jî di vî warî de, li gor îmkân û hêza xwe xebatê dike.

Jixwe meriv kevîr davê dara bi fêkî. Ku ne weha be, meriv tu îzah ji nivîsa Zinarê Xamo re nabîne. Ji ber ku bi çar mehan piştî derketina nivîsekê meriv rabe gotarekê li dijî binivîsînê re li ber îzahên din digre. Ezê benda ku Zinarê Xamo qala wê kiriye û paşê jî li gor dilê xwe meqes kiriye li jêr pêşkêşî xwendevanan bikim.

Di Hejmara Medya Guneşî ya 28'an ya meha Nîsanê de, di "îlawa 95 saliya Rojnamegeriya Kurdî û 6 saliya Medya Guneşî de" benda ku Zinar


jê hinek cumle girtine ez hemû bendên wê li jêr diweşînim.

.....Ji roja ku Medya Guneşî wek rojnameyeke panzdehrojî hate derxistin û vir de, me programmeke taybetî daye ber xwe. Divê bête zanîn ku di Medya Guneşî de, bi hevdu re derketina nivîsên Kurdî û Tirkî, heta pêvajoyekê ye ta ku an em bi serê xwe an jî bi hinekî din re, hem bi Kurdî hem bi Tirkî rojnameyên cuda derxînin. Tevî ku em xwe, bi fikra ku "tu dixwazî bila rojnameya me bête xwendin an neyê xwendin" bi wezîfeya fêrkirina girseyan bi Kurdî ve sînor nakin jî lê em bawer in ku em hem di warê girîngiya weşanêke bi Kurdî hem jî di warê jî terefê girseyan ve bi hêsanî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî de, ji herkesî bêtir hesas in. Û em ji bo pêkanîna pêwistiyan ku di vî warî de hene jî zor didin îmkânên xwe.

Lê di vê pêvajoya şiyarbûna neteweyî û ji nû ve vejiînê de, li gel girîngiya vê wezîfeya dîrokî, em dixwazin di warê bûyerên ku çêdibin de, lînerîn, pêşniyar û rexneyên xwe bigihînin girseyan û bidin munaqesê kirin jî. Wezîfeya kesên sosyalîst, şoreşger û welatperwer ne tenê şîrovekirina civatê ye, lê her wiha ji her alî ve guhertina civatê ye jî. Pirr eşkere ye ku ev wezîfe, îro nikare bi weşanêke xurî Kurdî pêk bibe. Ev, hem sewiyeya xwendin û nivîsandina bi Kurdî ya Kurdan û hem jî ji ber pêwistiya xîtabkirina raya giştî ya Tirkan, weha ye. Em qebûl bikin-nekin, ev rastiyek e. Yan na, tete zanîn ku em xwediyê wê kapasîteyê (bîrîkîma) ku bikaribin "Medya" an weşanêke din bi temamî bi Kurdî biweşînin....

Wekî ku li jor jî xuya ye ku Medya Guneşî negotiyê... "em dikarin weşanekî bi Kurdî derxin, lê em demaxin". Berevacî "bi Kurdî-Türkî derketin heta qonaxekê ye". Îcar meriv rabe gotinan ne li gor manayên wan lê li gor daxwaza dilê xwe şîrove bike.

Welatperwerê hêja Mihemed Hemidanoglu wefat kir



Di roja 12.8.1993'an de xebatker û welatperwerê hêja Mihemed Hemidanoglu ji ber nexweşîya penceşêrê (kanser) wefat kir. M. Hemidanoglu weke gelek welatperwerên Kurd ji ber xebat û tekoşîna xwe ya siyasî, mecbûr mabû ku derkeve derveyî welat. Wî bi salan di nav xebat û tekoşîna rizgariya Kurdistanê de kar kiriye. Li Diyarbekirê, di fakulteya Fenê da peryodek serokatiya Komela Xwendekaran kiriye. Herweha di destpêka sala 1978'an de, ketiye nav refên Partiya Demokrat ya Kurdistanê (PDKT) û dûre xebata xwe ya siyasî di nav refên KUK'ê de bi aktîfî domandiye. M. Hemidanoglu di sala 1982'an de ji KUK'ê veqetiya û grûbek bi navê "Şoreşgerên Kurdistanê" ava kir. Ew her gav dilxwaz û dozdarê yekîtiya hêzên siyasî yên tevgera Kurdistanê bû. Wî di xebata avakirina Têvgerê de jî, nûneriya rêxistina xwe dikir. Ew bi hewildan û xebatên ji bo avakirina bereyek yekbûyî ya Kurdistanê Bakur gelekî kêfxweş bû. Lê mixabin wî encamên vê xebatê bi çavên xwe nedît.

M. Hemidanoglu demeke dirêj bû li Almanyayê, li bajarê Kolnê dijiya û ji ber nexweşîya penceşêrê di 12.8.1993'an de wefat kir. M. Hemidanoglu di sala 1952'an de li qeza Sêwregê hatibû dinê. Ew zewicî û bavê 2 zarokan bû.

Armanc
Rojnama Kurdî ya mehane
Monthly Kurdish Magazine
Redaksiyon:
M. Elî
Hesen Mizgîn
Mirza Bextiyar
Lewend Firat
S. Rêving
M. Lewendî
Redaktorê berpirsiyar:
M. Elî
Berpirsê beşê Dimilîkî:
Malmîsanîj
Berpirsê rûpelên edebî:
Ehmed Huseynî

Adres:
Box: 152 16
161 15 Bromma
Sweden
Telefon
46-8-803135
Telefax:
46-8-801825

Utges av:
Kurdîska
Demokratîska
Arbetarunionen
Postgiro: 50 37 99-9
ISSN: 0348 7385

Abonetî
Prenumeration
Abonetîya Salekê
Li Skandinaviya
200 SKR
Maqam
Myndigheter
400 SKR
Li Ewropa
50 DM
Li derveyî Ewropa
40 \$
Anons/ilan
nîv rûpel/ en halvsidan
2500 SKR



Kongreya 11'em ya PDK-I bû kongreya yekîtiyê

PDK-I û Partiya Yekgirtin gihîştin hev

Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê di 16-23.08.1993'an de li Erbilê bi dirûsmê "Aştî, demokrasi" û aştî civiya. Kongre ji ber yekîtiya rêxistinî ya bi Partiya Yekgirtinê re bi navê kongra yekgirtinê hat bi nav kirin. Her weha Yekîtiya Demokrat a Kurdistani û Tevera Musilmanên Kurdên Feylî ji tevî vê yekîtiyê bûn. 3000 nûner û mêvan beşdarî kongrê bûn.

Ji bilî PKK'ê çî bigre nû-

nerên hemû partî û rêxistinên siyasî yên Kurdistanê û gelek nûnerên dezgeyên Kurdî û şexsiyetên navdar ên Kurd, nûnerên sê partiyên Tirk wek mêvan di kongrê de beşdar bûn. Herweha ji senator, parlamenter û nûnerên rêxistinên demokratîk û mirovhez gelek mêvanên biyanî jî di kongrê de amade bûn.

Di kongrê de guhertina herî mezin ya programê di warê armanca siyasî de

çêbû. Şûna otonomiyê, kongrê federasyon wek armanca siyasî qebûl kir. Herweha navê partiyê bû **Partiya Demokrat a Kurdistanê-Yekgirtin**.

Di dawîya kongrê de Mesûd Barzanî carek din ji bo serokatiya partiyê hat hilbijartin. Ji bo Komîta Merkezî 37 kes, wek cigirên wan jî 9 kes hatin hilbijartin.

Her tişt ji bo dewleta federe

Di roja 31'ê Tirmehê de li bajarê Meckenheim, nêzikî Bonnê ji bo alîkariya Kurdistana Iraqê şevê piştigiriyê ji aliyê Hevkarî-Komîteya hevkariya hêzên siyasî ya her çar perçên Kurdistanê hat amade kirin.

Di şevê de li ser navê hukûmeta Kurdistana federe Dilşad Barzanî axaftinek kir. Ew di axaftina xwe de li ser rewşa Kurdistana rawestiyê û bi van gotinan bangî Kurdên Ewropa kir: "Ez ji xwişk û birayên xwe yên ji hemû perçên Kurdistanê hêvî dikim ku yarmetiya dewleta xwe bikin û

hêvîdar im li seranserê Almanya û herweha li seranserê Ewropa, şevên yarmetiya desthilata dewleta federe li Kurdistana Iraqê bînin çêkirin".

Di şevê de 500 kes beşdar bû û 15 hezar Mark alîkarî hat civandin. Hunermend, dengbêj Saîd Gebarî û Viyan, Dilşad Saîd, Şêrîn, Birader, Diyar, Koma Govendê ya Enstîtuya Kurd li Belçîka û Şivan Perwer beşdarî bûn.

Piştî şevê li ser navê Armançê me ji Dilşad Barzanî pirs kir, di vê demê de hun wek hukûmeta Kurdistana federe ji xelkê Kurd çî

dixwazin? Wî weha bersiv da "Dewleta Kurdistana Iraqê pêwîstî alîkariya her Kurdekî ye. Rewşa me ya nûha û taybetî ji rewşa me ya aborî pir xerab e. Hêvîdar im ne bi tenê li Almanya, divê li Swêd û derên din jî şevên weha bînin çêkirin. Em bikaribin pereki kom bikin û ji bo Kurdistanê rêbikin".

Her ji bo vê armançê di 11'ê Îlonê de li Hamburgê jî şevê wê ji alî Rêxistinên Siyasî yên Kurdistanê ve li Hamburgê bê amadekirin.

Civata Kurd li Almanyayê konferansekê amade dike

Bi hêlên xwe yên cuda ve pirsas Kurd

Di 24, 25, 26 Îlonê li Krefeldê Civata Kurd li Almanyayê ve konferansekê amade dike. Mijara konferansê "Ji hêlên cuda ve pirsas Kurd" e. Ji bo konferansê gelek Kurd ji welat hatine dawet kirin.

Babetên ku wê di konferansê de bînin pêşkêşkirin û kesên ku wê pêşkêş bikin ev in:

1- Pirsas Kurd û mafên mirovî: Wê ji alî Sedat Aslantaş, serokê Komela Mafên Mirovî ya liqê Diyarbekir bînin pêşkêşkirin. Alî Tuku (Serokê civata Kurd) wê berpirsiyariya civînê bike.

2- Bi awirên karkir, esnaf û

senatkarên Kurd pirsas Kurd: Wê ji alî serokê Tes-Îş liqa yekem Alî Öncü û Sekreterê Giştî yê Komela Esnaf û Senatkarên Behlül Yavuz bînin pêşkêş kirin. Şefik Öncü (Sekreterê Giştî yê Civata Kurd) wê berpirsiyariya civînê bike.

3- Ji alî huqûqî ve pirsas Kurd: Wê ji alî Cigirê serokê Yekîtiya Baroyên Diyarbekir Sezgin Tanrikulu wê bînin pêşkêşkirin. Av. Osman Aydin wê civînê idare bike.

4- Xebatên demokratîk ya Kurdên derveyî welat û erkên me: Wê ji alî Vildan Tanrikulu (Serokê Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê) bînin pêşkêşkirin û wê ev celse ji alî Mehmet Tan-

riverdî ve bînin idarekirin.

5- Pirsas Kurd û idareyên deverî: Wê ji alî Haşim Haşimî (Serokê Belediya Cizîrê) ve bînin pêşkêşkirin. Serokê kevin yê Belediya Bîngolê Sait Yilmaz civînê idare bike.

6- Pirsas Kurd, partiyên siyasî û TBMM: Wê ji alî Muzzafer Demîr (Parlamenterê Mûşê yê DEP'ê) bînin pêşkêşkirin. Civîn ji alî Av. Rûşen Aslan ve bînin idarekirin.

7- Munakeşe û Pêşniyar: Yê beşdar dibin Sedat Aslantaş, Alî Ömncü, Bahlül Yavuz, Haşim Haşimî, Muzzafer Demîr û Sezgin Tanrikulu ne. Ev civîn ji alî Bayram Ayaz ve bînin idare krin

NEYNIK

Îro avakirina cepheyekê ne rast e

Hesen Mizgîn

Bûyerên li dinê wisa bi lez diqewimin ku mirov nikare di wextê xwe de tewrê xwe bistîne, şîrove bike. Li Kurdistanê jî ev yek wiha ye. Bûyer û guhertinên ku tînin holê, carina di saetêkê de, carina jî di rojek an jî di heftekê de tînin ji bîr kirinê. Şîroveyên ku hatibûn kirin, giringiya xwe winda dîkin. Wisa qewimiye ku rêxistin û partiyên me yê siyasî jî hatine nava van pêlên bûyer û guhartinan û ne ew bi xwe lê pêlên bûyer û guhartinan wan bi xwe re dibin. Xuya ye partiyên me hê jî ha ji realîta xwe nînin, di bin tesîra subjektîvîzma raya giştî de ne û ji objektîvîzmê dûr in.

Protokola ku di navbera PSK û PKK'ê de hate îmzekirin herçiqas di bîr û raya giştî de wek bûyerê erênî hate qebûl kirin jî ez xistim şikê. (Lê belê divê ez îtîraf bikim ku dilê min pê kêfxweş bû. Bûyerê rê ji bo diyalogan vedikir û guhertina tewrên siyasî tenê bi diyalogan mimkûn e.) Şikên min roj bi roj zêdetir bûn. Piştî demeke din di navbera Hevgirtin-KDP û PKK piştî jî di navbera PRNK û PKK'ê de protokol hatin îmzekirin. Tenê YEKBÛN'ê heya îro bi PKK'ê re protokol imze nekiriye. Ji bo çî nekiriye wek resmî ne kifş e.

Şikên ku di mêjiyê min de ne, ez wisa bawer im di mêjiyê gelek kesan de ne jî. Li ser wan şikan tînin axaftin, lê çî mixabin nayê nivisandin. Berî her tiştî, heya roja ku protokol hatin îmzekirin aliyê ku hêzên din bi "casûsî, xulamîya kolonyalist û emperyalîzmê" sûcdar dîkir, PKK bi xwe bû. Heya do ya ku guh nedida gaziye hevkariya hêzên din PKK bû. Ya ku bi PDK-I re protokol imze kir û piştî jî ew bi "xulamîya emperyalîzmê" sûcdar kir dîsa PKK bû. Ya Kemal Burkey bi "xulamîya Enternasyona- la Sosyalist" sûcdar dîkir PKK bi xwe bû. Ya ku welatparêzan, bîyî ku ezabê wîdanî hîs bike, dîkuşt, rê nedida muxalefeta di nav PKK'ê de û ew yek bi yek ji holê radikir dîsa PKK bi xwe bû. Ma gelo guhertina

PKK'ê ya xêrê ye? Bi ya min ev yek herçiqas ne di destê PKK'ê bi xwe de be jî xêrê de heye. Lê belê di vî warî de ez dibêjim partiyên me -PSK, Hevgirtin-KDP û PRNK- û di vî dawiyê de YEKBÛN (bi tevîbûna xebata cephekê) gelek ecele kirin, pêşeroj û fêkiyên pêşerojê nefikirin. Em bîjin protokola PSK û PKK'ê ji nişka ve derket holê lê çî bûbû Hevgirtin-KDP û PRNK'ê. Çî leza wan hebû? Çima wisa bi "erzanî" imze avêtin bine protokolan?

Carek PKK ji alî bîr û raya giştî ya Ewropayê bi awayek nebaş tînin naskirinê. Mohra terorîzmê li ser e. Piraniya dewletên Ewropî PKK'ê wek rêxistinek terorîst qebûl dîkin. Bivê nevwê ev qeneat û bawerî tesîrek negatîf li ser pirsas Kurd û Kurdistanê dike. Helbet ev yek ne tenê li derveyî welat, lê li hundirê welat jî kêman zêde heye. Lê ferqek heye; ew jî ew e ku heya do jî "rêxistinek terorîst" dihat behskirin lê îro ew bûne "rêxistinên terorîst", ango hejmara "rêxistinên terorîst" zêde bûne. Di vî warî de niyeta hikûmeta Tirkîyê çî ye ezê li jêr pêşkêşî we bikim. Min divê pêşî li ser xetera avakirina cepheyek bi PKK'ê re rawestim.

Wek min li jor jî qal kir, dema mirov bi lez û bez û bîyî ku neticê bifikire dest bi hin tiştan bike, tu encamek baş jê dernakeve. Bi ya min avakirina cepheyek bi PKK'ê re wê pirsas Kurdî tîxe rewşeke nebaş.

PKK bi salan e ku xwe ji rêxistinên din ên Kurda dûr xistiye. Bi wan re nehatiye diyalogên dûr û dirêj. Heya do jî guh nedida gaziye hevkariyê. Wisa bûbû ku PKK bi serê xwe mabû. Li gor PKK'ê hemû partî û serokên Kurda, yan "xizmetkarên emperyalîzm û Enternasyona la Sosyalist" an jî "hevkarên dewletên mêtîngehkar" bûn. Bi vî jî mêjiyên endamên xwe şûstîye. Ma gelo di vî rewşê de ya herî baş û ya bi mantiq avakirina cephe ye? Bi ya min na. Bi ya min a herî baş bi mantiqî ew e ku mirov rê û wext bide PKK'ê daku şaşitiyên ku -ew bi xwe jî dibêjin- kirine ji bîr û raya giştî re beyan bikin, munaqesha wan bikin daku mêjiyê do roj bi roj bête guhertin. Divê PKK fêrî toleransê bibe û ji rêx-

Dûmahîk r.11

RAMANÊN RAMANWERAN

Divê rê ji çareyan re vebin !

M. Xelîl

Di nav van çend salên dawî de rewşa jeo-polîtîk a cîhanê bi qandî civat ji koçekê derbasî koçeke din bibe, hate guhertin. Koça bi Şoreşa Oktobirê dest pê kiribû gihast qonaxê nû û li paş xwe komek neteweyî û dewletên lipaşmayî, civatek ku bi salan bi nîrê zorê lihevragirtî û xwedanê gelek problemên civakî, neteweyî, aborî û çandî hişt. Vê guhertinê bi xwe re hevsengiya nav hêzên ku giraniya wan li ser rewşa jeo-polîtîka cîhanê hebû, têk da. Têkçûna vê hevsengiya ku piştî Şerê Cîhanê ê Duduwan çêbûbû, bû hoya ku partî û hêzên polîtîk ên gelê Kurd ji mîna hêz û dewletên cîhanê li ser rewşa xwe rawestin. Polîtîka xwe a neteweyî û navneteweyî li gora rewşa îro serast bikin, ta ku bi rewşa cîhanê ve biguncin û bigihên armançên xwe. Di ciyê dîtina vê rastiyê de beşekî sosyalîstan çavên xwe girtine, mîna ku tiştê neqewimiyê û rewşa cîhanê ya berî 20-30 salan îro ji dom dike, temaşeyî rewşê dikin. Ji ber hebûna kurekê masîyan pir kes ji hoyên serneketin û çaresernebûna doza gelê Kurd li Kurdistanê Bakur bi parêzgeriya sosyalîzmê û xebatanehênî û çekdarî ve girêdidin.

Rast e, dewletên "Sosyalîzma Reel" fena di hate gotin derneketin û têk çûn. Li wan welatan dogmatîzm û nedemokratiyek xurt hebûye. Mafên mirovan li ber piyan çûne. Bi propaganda wuha kiribûn ku, teoriya sosyalîzmê û îdeolojiya çîna karker bikevin bin talda sudên dewletê ên Yekîtiya Sovyetan û dewletên "Sîstema Sosyalîzma Reel". Ji ber wê ji hilweşana sîstemê û sazûmana wan bingehê bêhêvîbûna ji sosyalîzmê xurt kir. Lê bîyî nivîsarên ku armanca wan dijîtiya sosyalîzmê û propaganda be, hîna lêkolînên ciddî ku hoyên têkçûnê berbiçav bikin û wê bi teoriya sosyalîzmê ve girêbidin, nehatine kirin. Dema ji bo wan dewletan û sîstemê rewş ev be, lêkolîner û zaniyar hîn nikaribin hoyên têkçûnê bi teoriya sosyalîzmê ve girêbidin; heger çewtiya kadro û berpirsiyarên tevgera Kurdistanê Bakur ne bi dogmatîzmî, sekterîzmî û bêpolîtîkabûnê ve bêtêgirêdan, ew bi îdeolojiya çîna karker ve bête girêdan, careke din tevger durî rastiyê dikeve û dê nika-ribe çare û riyên reel vejîne.

Îcar em vegerin ser doza

xebata nehênî û çekdarî. Rewşa cîhanê ya nûh bû yek ji hoyên ku bingeha sazûmanên dîktatorî û paşmayên qirnê navîn tevî ên faşîst biheje û ew ber bi koça dawî bikevin rê. Wuha dixuye ku di rojên pêş de, dawûdezgehên mîrî ên cîhanê dê parastina mafên mirovan ên neteweyî û demokratîk bigirin rêza pêşî. Li seranserî cîhanê ew birûbawerî dê gelek dost û piştgirî li dora xwe kom bikin. Lê pêkanîna vî tiştî û çekirina wan dezgehên ne hêsan e. Mîna ku di serê rewşenbîr û ramangiran de cih digirin, di nav civat û dezgehên mîrî de bi hêsanî û zû cih nagirin. Heya gihastina

Eşkere ye ku ne sosyalîstiya hêzên Kurdistanê Bakur, ne xebata nehênî û şerê çekdarî nebûne hoyên bingehî ên serneketina tevgerê. Ne jî di warê navneteweyî de ji wan re serêşî çekirine.

wê koçê li pêşiya gel û neteweyên ji wî mafî bîpar, gelek rojên dijwar hene. Jixwe tevî ku dewletên Ewropa-Rojava pêşengiya wan birûrayan dikin, li wan welatan gelek dezgehên demokratîk û parastina mafên mirovî pêk hatine û di nav gel de kêman pir bingehêk danîne jî, hey a îro wan dewletan dev ji çekirina çekên nujen û xurtkirina hêza leşkerî bernedane. Îro jî tu îşaretên ku di demeke kurt de ew dê dev jê berdin xuya nakin. Gava li Ewropa-Rojava, Îskandinaviya û Emerîka rewş ev be, li Rojhilata-Navîn ku piraniya dewletên herêmê li ser bingehê mantiqê zorê avabûne, ji bo gihastina wê demê gelek wext divê. Êdî herkes dizane ku Iraqa Seddam ji ber komkirina çekên pir ket vê rewşê û hîn dev ji peyda kirin û vejandina çekan bernedaye. Sûriye, Îran û Tirkiye jî li paş wê nemane. Sûriye bi babet babet çek mişt bûye. Îran li rîya çekirina çekên atomî digere û li gor gotinê di nav 7 salan de ew dê bigihê armanca xwe. Ma dema cîran bi vê mebestê li rê û çareyan bigerin, qey neviyên Moxoliyên şerkar Osmaniyên dagirker destûpê girêdayî namînin?!

Tevî van tiştan hemîyan jî, guherîna cîhanê sîdarî li ser rewşa Rojhilata-Navîn dikin, çawa ku Erebiyana Suudî, Urdu û Kuweyt hin guhertinan dikin, ew doz dikeve rojê polîtîk a Tirkiye, Îran û Iraqê jî. Lê ne diyar e kengî û bi çî awayî ew dê guhertinan pêk bînin û dawûdezgehên demokratîk saz bikin.

Ji bîr van hoyan çekda-

nîn ne yekalî ye. Ew rasterast bi rewşa terefan ve girêdayîye. Jixwe guhertina polîtîka Kurdan û bijartina awayên têkoşinê rasterast bi helwesta dewletên dagirker ve girêdayîye. Li gor helwesta wan Kurd mecbur mane nehênî têbikoşin, çek hilgirin, li zindanan bijîn, li biyanîyê bin penaber, herin ber sêdaran, bikevin ber êrîşa çekên kimyayî û hwd...Heya îro jî dengê Kurdan bi vî awayî, bilind bûye û gihastiye raya cîhanê a demokratîk û mirovperwer. Ne ku riyên baştir û bêderdûkul li ber Kurdan hebûne, lê dîsa berpirsiyarên tevgerê ev rê hilbijartine. Tevî vê rastiyê jî rexneyên ku li tevgera Kurdan hatine girtin

kêman nebûne û berdewam in. Bi vî gotinê mebest ne ew e ku tevgera gelê Kurd bê kurûkêmasî ye û her rê û îmkân di ciyê xwe de bikaranîne...Heger kêmasî nebûna û Kurd ji her keysê destkeftî bûbûna, ez jî bawer im ku tevgera niştîmanî îro dê gihastibûna qonaxê baştir.

Eşkere ye ku ne sosyalîstiya hêzên Kurdistanê Bakur, ne xebata nehênî û şerê çekdarî (gava di ciyên xwe ên pêwîst de hatibin bikaranîn) nebûne hoyên bingehî ên serneketina tevgerê. Ne jî di warê navneteweyî de ji wan re serêşî çekirine.

Çawa ku weşandina kovar û rojnameyan, sazkirina komele û partiyên legal, ango xebata demokratîk û destûrî bi serê xwe nikarin barê tevgera niştîmanî ragirin û hemî hêza niştîmanî aktîf bikin, xebata nehênî û çekdarî jî bi serê xwe nikarin wê vîtiyê pêlîbînin. Li rex van babetên xebatê, divê giringiya karê dîplomasiya navneteweyî, çekirina dezgehên propagandayê ji bo Kurd û biyanîyan, sazkirina hemû hêz û grupên civakî û li hev ragirtina hêza niştîmanî bête dîtin. Li gora realîta cîhanê û a herêmê polîtîka bîne vejandin. Di tu waran de valabûn û bêpolîtîkabûn nemîne ku tevger bikaribe bi vatîniyên xwe rabe. Gava ew awayên xebatê ên din neyêne dîtin û di nav hemû babetên xebatên de hevsengî pêk neyê, careke din dê rê li ber tevgerê asê bibe û vîtiyê polîtîkayên nûh bikeve rojê tevgera gelê Kurd.

Stiriyên me

Zinarê Xamo

Ma em giş bîaqil in?

Çendakî berê Ezîz Nesîn di hevpeyvîn ya jî di civînekê de ji kerba dilê xwe, wek gazin gotibû: "Ji sedî şêstê Tirkan ehmeq in, sextekar û durû ne".

Wan rojên ku rojnameyên Tirk li ser van gotinên E. Nesîn dinivîsandin ez û çend heval jî em li ser vî meselê peyivîn. Di nav xwe de mejî qala gotinên E. Nesîn û reaksiyona li hember wî kir. Hevalan, mîranî û cesareta E. Nesîn teqdîr dikirin. Dîgotin: "Welle mîrîk ji şûrê xwe tûjtir e, qet xemê ji kesî naxwe, baweriyên xwe bîyî sansor dibêje. Divê meriv vî şêla wî pîroz bike".

Ez bawer dikim ne van hevalan tenê, lê gelek Kurdên din jî kêman zêde wiha fikirîne û kêfa dilên xwe bi gotinên E. Nesîn anîne.

Helbet gelek hêsa ye gava meriv ji van gotinên E. Nesîn re li çepikan xwe, bibêje her bijî! Di şêlek wiha de tu marîfet tune ye, her kes dikane vî "demokratiyê" nîşan bide. Çimkî di rexneyên wî de serê derziyê nagihîje me. U tew di ser de jî berê xwe daye Tirkan...

Ez nikanim li ser rastî û çewtiyên gotinên E. Nesîn tiştêkî bibêjim. Çimkî di vî warî de di destê me de tu îstatîstîk tune ye. Hejmara hatiye dayîn hejmareke texmînî ye ku E. Nesîn bi xwe jî dibêje. Lê li gor hinek Tirkên tevî vî munaqesê bûne qet ehmeqê Tirkan tunene, hemû Tirk mirovên normal in. Li gor wan, E. Nesîn li ciyê rehetiyê buhtan li wan kiriye. Lê li gor hinek Tirkên din jî, E. Nesîn hejmara ehmeqan pîr kêman kiriye, hejmara rastî jî "sedî şêstî" hîn zêdetir e.

Axir wer xuya ye ku di vî warî de li ser hejmareke musterek lihevkin ne mumkûn e. U jî xwe ya muhîm jî ne ev e. Di vir de, ji rastî û çewtiya gotinên E. Nesîn muhîmtir, ew diwêre bîr û bawerî û qenetên xwe bi hawakî vekirî bibêje. U jî ber ku gotiyê "ji sedî şêstê" Tirkan ehmeq in, bîyî çend kesên faşîst û Pan-Turkîst kesî jê re tiştêk negot, ew xayîn û dijminê gel îlan nekir; jê re negotin tu hevkarê dujmin î.

Di nav civatekê de hebûna tolerans û tehamula ji fikrên hev re nîşana pêşketina medeniyetê ye. Gava di civatekê de, çî rast çî çewt însan bê tîrs, bi hawakî azad biwêribin dîtinên xwe bibêjin û jî ber ku dîtinên xwe gotine nebin xayîn û dijminê gel, mana xwe ew e ku bayê medeniyetê pîr hindik bi serê ferdên wê civatê ketiye.

Li gor welatên medenî yên Xerbî, civata Tirk civateke paşdemayî û bêtolerans e, însan li hember fikrên hev bêtêhamul in; zû "îfada" hev digrin. Lê li gel vî bêtoleransiya civatê jî, E. Nesîn cardin dikane bi van gotinên giran civata xwe rexne bike, ji wan re bibêje hûn "ehmeq" in. Çimkî heger hûn ne ehmeq bûna hûnê li hember van kirînan neînsanî bédeng nemana, we yê muheqeq serî hilda. Madem hûn li hember zulmê, bêhuqûqî û dîktatoriyê bédengin, wê gavê hûn ehmeq in.

Helbet ehmeq û sextekarên Tirkan tenê tunene, yên her milêti hene. Lê em dizanin çawa ku kes nabêje dewê min tîrş e, her wisa kes ehmeqiya xwe jî bi rehetî qebûl nake.

Civata me ji civata Tirk ne pîr pêşketîr e, hetta di gelek warî de em ji wan pîr bi paş de ne. Ew kêmasî û anormaliyên ku E. Nesîn lê rexne digre ne mexsûsî Tirkan tenê ne, serî digihîje me jî.

Ez bawer dikim di civata me de jî mirovên derewan dikin, mirovên sextekar û durû hene. U heger ji yên Tirkan ne zêdetir bin, ne kêmtir in.

Di civata me de jî kesên çavsor û dîktator hene. Civat, li hember çavsor û dîktatoran bédeng dimîne, serî ditewîne.

Di civata me de jî tîrs wek kabûsekî ketiye ser dilê millet, mirov bûne koleyên tîrsê. Kêman kes diwêrin fikrên xwe bibêjin û jî bona wan fikrên xwe fedekariyê bikin.

Bi kurtasî di civata me de jî gelek pîsî, xerabî û nebaşî hene ku divê meriv li dij wan derkeve; ji bo civateke bi tolerans û hîn demokratîk û mirovên hîn hişazad têkoşinê bide. Ev jî hinekî girêdayî pêşketina rexnegirtinê ye.

Gelo ji nav me jî yekî wek E. Nesîn rabe û rexneyeke wek ya wî li me bigre emê çî bibêjin?

Emê ji fikrên wî re tehamulê nîşan bidin?

Emê wî, xayîn û dijminê gel îlan nekin?

Emê di kovar û rojnameyên xwe de çî bidin gotinên wî?

Gelo ji nav me hinek wê biwêribin bi hawakî eşkere, wek piştgiyîya E. Nesîn kirin, piştgiyîya wî jî bikin?

Kêmasî û çewtiyên yê li hember xwe rexnekirin ne marîfet e, ne nîşana medenîbûnê ye. Marîfet ew e ku em kanibin xwe jî rexne bikin û li hember rexneyan bi tolerans bin...

Lêkolîn

Du destnivîsên Ebdurrezaq Bedirxan:

Dokumentên giranbuha
ji dîroka rewşenbîriya Kurdan

Ebdurrezaq Bedirxan yek ji wan Kurdên welatpêrêz û şoreşgerên birêz bû ku jiyan xwe diyarî oxira azadiya Kurdistanê û pêşketina çanda gelê Kurd kir.

Têla jiyana wî di 1918'an de li ser sêdara Tirkên hat birînê. Di destpêka sedsala XX'an de rojnemeyên Ewropî, Rûsî, Ermenî û Tirkên li ser navê Ebdurrezaq gelek caran sekînne. Her gaveke wî, her gotineke wî, ji ber qeşema rojnemeyan bû guhdarî derbas nebûye. Xwediyên van nivîsaran karkirina Ebdurrezaq li gorî siyaseta dewletên xwe ronî kirine û nîrx dane. Ji ber vê yekê nivîsarên wan di rûpelên rojnamê de bi mana xwe ji hev dûr in û gelek caran ji eksi hev in.

Ebdurrezaq Bedirxan dikaribû bi piştevaniya Sultan Ebdulhemîd II'an di burc û serayan de wezîfa xwe ya bilind bidomanda, bi tîr şadî bijîya. Lê wî rîya xizmeta gelê xwe kire armanç û ji ber wê jî bû kelemê çavê Sultan der-dora wî.

Malbata Bedirxan ji kevneroj de mîrîtiya Botan dikir. Di destpêka sedsala XIX'an de bi destê zorê Emîrata Botan hilweşiya û mala Mîr ji Kurdistanê cîguhêzî Stanbolê bû.

Sultan dixwest ku ew welat û gelê xwe, ziman û çanda xwe ji bir bikin, bibin kolê text û taca

dewleta Osmanî. Lê belê ji wê malbatê di sedsala XIX-XX'an de gelek merivên xuya; nivîskar, rewşenbîr, zana derketin. Piraniya wan rîya azadiya welêt dan ber xwe û li ser wê rîya pîroz jî canê xwe dan.

Di 1906'an de Sultan li Stanbolê Ebdurrezaq Bedirxan û hemû neferên malbata wî girtin û kirin kelê. Ebdurrezaq çar sala li sirgûnê di zîndana Trîpolê (li Afrîqayê) de ma. Piştî vegerê, di 1910'an de li Stanbolê ji xwe re cî-star nedît.

Ebdurrezaq mecbûr bû rîya muhaciriyê bide ber xwe û bireve Rûsyayê. Armanca wî îcar jî pîrsa azadiya miletê Kurd, xebata pêşvebirina rewşenbîriya Kurdan bû. Ji bo ku dengê wî û berê xebata wî bigihêje Kurdan, wî hêwra xwe li cîkî nêzikî Kurdistanê hilbijart, çû Qafqazê. Xwest li bajarê Êrivanê, nêzikî sinorê Rûsyayê û Tirkîyê bingeh bigre, lê hukumdariya Rûsyayê hêwra Ebdurrezaq guhaste ser Îranê ser navçeya

Koyê. Ew cî wê demê di bin kontrola eskerên Rûsyayê de bû, pêvgirêka sinorê sê dewletan bû. Wê navçeyê di salên 1910-1917 de, gava Ebdurrezaq Bedirxan lê hêwiribû, di meydana siyasî, dîplomasiyê û leşkerî de dewreke mezin dîlîst. Deng û basên Kurdistanê jî zû digihîşt vir.

Pîrsa Kurdan û Kurdistanê di nav siyaseta Rûsyayê de berî Şerê Cihanê yê Yekem, li vîra, li Roavayê Îranê bi destê xebatkarên dîplomasiyê û sereskêrên Rûsyayê bi xurtî di hate pejirandin û meşandinê. Di navbera van salan de, Kurdologên bi nav û deng V. Minorski û V. Nikitin karên xwe yê dîplomasiyê li vî herêma Îranê dest pê kirine û bi aktîfî bi pîrsa Kurdan mujûl bûne.

Di nava vî gêjgerîna siyasî-eskerî de rola Ebdurrezaq Bedirxan mezin bûye. Bi gelek Kurdên navdar re, dayîn-stendina siyasî û kulturî dikir. Her weha xizmeta wî ji bona seresker û dîplomaten Rûsan ji gelekî bikêrhatî bû. Ebdurrezaq bi her awayî dikir ku nûnerên Rûsyayê bi regekî baş gelê Kurd nas bikin.

Ebdurrezaq Bedirxan, tevî karê siyasî, karê rewşenbîriyê jî bi xurtî dimeşand. Gava konsûlên zana û rêwiyên Ewropî û Rûsyayê rastî wî dihatin, pê re rûdiniştin, Ebdurrezaq ji wan re li ser doza Kurdan lîteratura kevne, xu-xeysetên gelê Kurd bi merdane bahs dikir, da ku zanîna wana çewt û kêlî li ser Kurdan bi tevayî bê guhartinê ku ew bizanibin Ji Kurdan Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî derketine. Kurd ne koçerên duh û pêr in, koka wan jî Mîdyayê tê.

Îro gava ku em nivîsarên wan zanayên Ewropî yê 70-80 sal berê ji arşîva derdixin û dixwînin, em dibînin ku Ebdurrezaq jî tesîrek mezin li ser wan hîştîye da ku ew bi dilovanî û xêrxwazî li ser Kurdan binivîsin.

Di 1913'an de li Xoyê Ebdurrezaq Bedirxan û Simko tevî hinek serokeşîrên Kurdan komeleke rewşenbîriya bi navê "Gihandinî" ava kirin. "Gihandinî" jî bo zarokên Kurdan dibistaneke taybetî, vekiribû. Armanca wê ew bû ku zarokên Kurdan li ser erka ronakbîrî û xwendina dibistanên Ewropayê û Rûsyayê zanîna xwe bistînin da ku paşwextiyê ew karibin li Unîversîtetên Rûsyayê cî bigirin û xwendina xwe dom bikin. Ebdurrezaq li ser komela "Gihandinî" û dibistana Kurdî difikirî bike pîreke asê ji bo pevgirêdana çand û zanyariya Rûsyayê û gelê Kurd.

Du bûyerên xuya yê sala 1913'an di bîrweriya Ebdurrezaq da şopa xwe ya kifşîst. Yek, rastpêhatina wî bû tevî karkerê Unîversîtetê Petersbûrgê H. Orbelî gava ew ji bo lêkolîna ziman, rabûn û rûniştina ehlê Muksê hatibû Tirkîyê û ya duduyan ew rêwîtiya Ebdurrezaq bû li Petersbûrgê, rastpêhatina wî tevî zane û

rewşenbîrên wî bajarî.


Ji rastpêhatina Ebdurrezaq û H. Orbelî wekî di bîranînên Orbelî da dixwuyin, em dibînin ku di navbera van herdu xweşmêran de program û daxwazên qenc peyda bûbûn. Bîrara wan hebûye tevayî hêzeke xurt bidine lêkolîn û propaganda nimûneyên edebiyata Kurdî ya klasîk. Îspatiya vê yekê, yek ji wan dokûmentan e ku bi navê "Pêşniyar" Ebdurrezaq di 1915'an de nivîsiye. Ev dokûment me di arşîva Rûsyayê Qeyseriyê da dîtîye.

Çûyina Ebdurrezaq ji bo Petersbûrgê bi programa mezin ve di hate girêdanê. Wî dixwest pîrsên giran: Azadiya Kurdistanê û pêşxistina çanda gelê Kurd, li paytexta Rûsyayê de ne ser bingeha praktîk. Li ser pîrsa azadkirina Kurdistanê, wek em dibînin, karmendên paytexta Rûsyayê sozên mezin nedane destê Ebdurrezaq. Lê di meydana rewşenbîriyê da, bi piştevaniya dost û nasên xwe yê kevî li Petersbûrgê Ebdurrezaq karibû bigihîje hinek encaman.

Ev her du dokûmentên ku Ebdurrezaq nivîsîne û em li jêr rabe xwendevanên dîkin, gelekî bi qîmet in, çimkî ew perdeke tarî ji ser dîroka rewşenbîriya Kurd hilûnin û didin ronîkirinê.

Her du dokûment jî ku pêşniyar in, Ebdurrezaq di 25'ê Sibata 1915'an de li Tîblîsê nivîsîne.

Di 1914'î da gava şerê cihanê



Pêşniyara Ebdurrezaq Beg

yê yekê dest pê bû, provakatorên ji Tirkîyê li ser Ebdurrezaq gili belakirin xwedêgiravî ew casûsê Tirkên e. Hinek karmendên Rûsyayê jî van gotinên bêbingeh zû bawer kirin û jî navçeya Êrmiyê cîguhêzî Tîblîsê bû, wî ew her du dokûment hazîrkirin û şandine Petersbûrgê. Dokûment bi Rûsî hatine amadekirinê. Xuya ye dostên wî jê ra wergerandine û daktilo kirine.

Li Petersbûrgê, dostê Ebdurrezaq N. Marr û H. Orbelî armanca Ebdurrezaq bi cî anîn. H. Orbelî di 1959'an de li Petersbûrgê di Înstîtûta Rojhilatnasyî de kabînetê Kurdnasyî vekir û lê bû piştevan da ku kadroyên Kurd li meydana Kurdnasyî bixebitîn.

Celîlê Celîl

PARTIYA ŞERÎF PAŞA

Malmîsanîj

Di Armançê de carna nivîsên tarîxnas Celîlê Celîl derdikevin. Di piraniya van nivîsan de nivîskar li ser belgeyên tarîxî disekine, ez bi xwe wek xwendevanekî gelek ji wan îstifade dikim. Di hejmara 140. a Armançê de mamoste Celîl li ser nameyeka Şerîf Paşa disekine. Di vî nivîsê de şaşiyek piçûk heye, ez dixwazim behsa wê bikim.

Nivîskarê nivîsê gava behsa Şerîf Paşa dike, dibêje "Li Parîsê ewî hêzên opozîsyonê civandin dora xwe û partiya Yekîtiya Liberalên Osmanî (Osmanlı Hürriyet ve Adalet Fırkası) damezirand. Bû serokê vî partiyê û berpirsiyarê organa wê Meşrûtiyetê."

Şerîf Paşa wê demê li Parîsê serokatiya du partiyên Osmanî kiribû: 1) Islahat-ı Esasiye-i Osmaniye Fırkası (1909-1913), 2) Osmanlı Hürriyet ve İtilaf Fırkası

Partiya ku mamoste Celîl di nivîsa xwe de behs dike, "Hürriyet ve İtilaf Fırkası", yanî "Partiya Azadî û Lihevkerî-nê" ye. Xûya ye ku navê vî partiyê di nivîsa mamoste Celîl de, di nava parantêzê de şaş hatîye nivîsîn. Jixwe li ser nameya Şerîf Paşa ya ku fotokopiya wê di Armançê de derketîye jî bi herfên "Erebî klîşa" "Osmanlı Hürriyet ve İtilaf Fırkası Paris Merkez-i Umumî" heye.

Ez dixwazim derheqê rojnama Meşrûtiyet (Mécheroutiette)ê jî çend gotinan bêjim, dibe ku bi kêrî hin xwendevanan bîn. Ev rojnâme li Parîsê çap bûye, "mudîr"ê wê Şerîf Paşa bûye. Li gorî hin çavkaniyên Tirkî dinivîsin, Meşrûtiyet -bi nivîsîna Frensî Mécheroutiette- bi zimanê Osmanî, Frensî û carna Îngilîzî hatîye weşandin; hejmara wê ya pêşîn di 15. 10. 1909'an de derketîye. Hejmarên wê yê 5. (1910) û 18. (1911) li Ankarayê, di "Millî Kütüphane"yê de hene.

Ez bi xwe li Frensayê di hin kutubxaneyan de li vî rojnâme yê geriyabûm lê min peyda nekiribû. Li gorî agahdariyên ku min ji kutubxaneyê Strasbourgê girtibûn, hejmarên 11-13. (1910), 5. (1911) û 14. (1912) li Fransayê li kutubxaneyê bajarê Toulouse'ê hene.

16. 8. 1993

1. Pêşniyara Ebdurrezaq Beg ya li ser hewcedîtina bingehdanîna beşê zimanê Kurdî /li Petersbûrgê/

25 Sibata 1915

Ji ber vê ku zimanê Kurdî li ser bingeha nivîsara bi herfên Erebi nikare bi başî diyar be, komela "Gihandinî" bîryar girtiye, ji bona vî armançê herfên Rûsî bi kar bîne. Ji min re pêk hatiye ku tevî akademîk N. Yû Marr li ser vî babetê bixavim. Dibistanên ku wê li Kurdistanê Iraqê vebûn û dibistana ku li Xoyê hatîye vekirin, dersên zimanê Kurdî wê li ser vî elîfbayê derbas bibin, Niyeta komelê heye ku xortên Kurda ji bo xwendinê bişîne Rûsyayê.

Mixabin ku ne li Ewropayê ne jî li Rûsyayê bi taybetî guh nadin ser ziman û lîteratura Kurdî, di Unîversîteya Qeyseriyê ya S. Petersbûrgê de kafêdra hemû zimanan hene xên ji zimanê Kurdî. Bi rastî pîrsa Kurdan bi giraniya xwe ya vî gavê dibe pîrsa here berbiçav û li Ewropayê Rojava ji bo hînbûna zimanê Kurdî îdî dest bi civandina materyalan kirine.

Daxwaza Kurdên xwendewar ew e di meydana zanîna Kurdistanê, dîroka wê û ziman, lîteratura Kurdî de rola Rûsyayê bibe ya sereke. Ev yek gereke, qet ne bona wê ku Kurd bi hejmara mezin li Rûsyayê dijîn û dilê Kurda bere-bere li ser Rûsan dîke. Gava kafêdra Kurdî li Unîversîtetê Qeyseriyê ya S. Peterbûrgê bingeh bigre, nav û dengê wê li Kurdistanê bela be û wê daxwaza Kurdan, ji bo ku bi çanda Rûsî ve bîn girêdanê wê zêde bi hêz be.

Ji aliyê din ve, feyda kafêdra Kurda wê ji Wezîrtiya Karûbarê Derva ra jî hebe, çimkî hinek konsulxanê di nava Kurdan da bela bike û wê dayîn-standina wana tevî jîyanvanê cî hêsa bike.

Ebdurrezaq

2. Pêşniyara Ebdurrezaq Beg li ser hewcedîtina çûyina Orbelî ji bo Kurdistanê

Î. A. Orbelî yê ku li Unîversîtetê Qeyseriyê San-Peterbûrgê hiştîye /bona kar/ dema hate Turkiya Asya li herêma Muksê, di navbera katekî kin da zaravê cî bi başî hîn bû, materyal ji bo gramera Kurdî û hin gotin ji bo ferhengê kom kirin. Ew yekî zîrek e û întêresa wî li ser zimanê Kurdî pîr mezin e. Di vî demê de berêz Orbelî elîfba Kurdî ser elîfba Rûsî bona bikaranîna praktîk pêk aniye.

Heger di nava havîna tê de berêz Orbelî bi qayiliya unîversîte û bi alîkariya Wezîrtiya Karûbarê Derve madî bû şandin Îranê bal min, emê karibin bi destê zanayên Kurdan gramera Kurdî û ferhengê bi serhev da bînin, şewirandinên lîteratura Rûsî yê balkêş ji zimanê Rûsî wergerînin ser zimanê Kurdî û diwanên şairên Kurda yê bi nav û deng ku heta vîga li ser tu zimanê Ewropî nehatine wergerandinê, emê ji zimanê Kurdî wergerînin. Karê berêz Orbelî di vî meydana de jî bo nêzîkkirina her du gelan wê bibe xizmeta mezin.

Ebdurrezaq

ALA KURDÎ

□ Mahmûd Lewendî

● Wek her milleti, Kurd ji xwediyê alekê ne. Ala Kurdan a îro, sor, sipî, kesk e û di navîna wê de ji rojek zer heye. Ev al di 1920'an de ji alî Teşkilatî İctimaîye Cemiyetî ya Kurdan ve hatiye tesbîtkirin. Û ev 73 sale ku Kurd wê bê munaqêşe wek sembola rûmet û hebûna xwe dibinin.

● Mistefa Paşa Yamûlkî yek ji muessisên Teşkilatî İctimaîye Cemiyetî ya ku şiklê ala Kurdî tesbît kirîye û di hukmata Şêx Mehmûd de ji bûye wezîr û berpîşîyarê rojnama niv resmî ya vê hukmatê; Bangî Kurdistan, ne dîr e ku ala Kurdî ya Şêx Mehmûd ku di 10.10.1922'an de hatiye tesbîtkirin ji bi pêşniyara wî hatibe qebûlkin.

Her millet, netewe, xelk û dewlet aleke wan heye. Al nişana huwîyeta wan e, sembola hebûna wan e. Ala her milleti bi şiklekî ye, reng û sembolên wê bi awayekî ye. Wek her milleti, Kurd ji xwediyê alekê ne. Ala Kurdan a ku îro tê bikaranîn sor, sipî, kesk e û di navîna wê de rojek zer heye.

Di tarîxê de Kurdan kengî al, an jî sembolek ku şûna alê bigre bikaranîne, em baş nizanin. Lê ew Kurdên ku ev serê 6-7 hezar salane ku li Kurdistanê, yanê li cihê xwe yê nuha dijîn, béguman wan jî gelek dewlet û îmarêt avakirine. Û wekî her dewlet û îmarêtên qedîm, wan jî miheqqeq alek, an jî li şûna alê sembolek bikaranîne. Yanê ew dewletên wek Mittanî, Hurî, Subarî, Xaldî, Kardox, Kasî, Med û hîn gelekên din ku di tarîxê de rolek mezin listine, leşker çekirine, bajar û medeniyet avakirine û li gor tarîxzanan jî bav û kalên Kurdan e, divê ku xwedî al bin. Dîsa ew îmarêtên Kurdan, wek Şedadî, Merwanî, Botan, Soran, Erdelan, Bahdînan û hîn gelekên din, her çendî niv serbixwe bûn jî, lê li mizgeftan bi navê mîrên wan xutbe dihatin xwendin, xwedî leşker û qesr û avahiyên mezin bûn. Ev îmarêtên ku bi salan li Kurdistanê

hukum kirin, gerek alek an semboleke wan a ku li şûna alê bi kar dianîn hebûya.

Mîr Bedîrxan (1802-1868) ku seranserî Kurdistanê di bin hukmê wî de bû, xwedî pere û top û tîfing bû. Li ser navê dewleta xwe pere derxistibû. Hê wê wextê tîkilî bi Ewropayê re danîbû, ji bo birêvebirina dewleta xwe xwendevan şandibû Ewropayê. Li ser Gola Wanê ji bo parastin û ticareta dewleta xwe kêştiyên şer û ticaretê dabû çekirine. Gelo meriv dikare bibêje ku Mîr Bedîrxanê ku hewqas tişt kirîye, bê al be. Béguman na! Lê ji ber ku tu belgeyek ji dewra berê di destê me de tune, em nizanin alên wan çawa bûn.

Wex efsane her Kurd bi çîroka **Kawa** dizane. Kawa hesinger e. Pêştîmalek wî heye. Piştî ku li hember Dehaq bi ser dikeve, dibe hukumdarê welêt û pêştîmala xwe jî wek al bi kar tîne. Her çendî efsane ye, lê tede al hatiye bi kar anîn.

Dîsa di klasîkên Kurdî de jî gelek şaîr û nivîskarên Kurdan wek gotin al bi kar anîne. Ji wan diyar dibe ku gotina alê ji kevn de di nav Kurdan de heye û wek gotin ji neku "al", lê "ala" hatiye bi kar anîn. Bi ya me jî divê ku rastîya wê welê be. Çend mînak:

Zalimê kuştîm şepalê,
Nazikê, qencê delalê,
Bûn hîcaba zîlf û xalê,
Êdek û ala û tox.
(Ji Dîwana Melayê Cizîrî, 1407-1481)

Bejn û bala tox û ala
Mîn kirin vêkra mitala
Çîçeka terhînî wala
Dil ji min bir, dil ji min.
(Ji Dîwana Melayê Cizîrî)

Lê me hêvî wasiq e ez feqîr
Jêrî alaya te bîm roja 'esîr.
(Ji Mewluda Melayê Batê, 1417-1491)

Ya Reb îmanê dixwazin em
midam
Jêrî alaya Muhemmed wesselam.
(Ji Mewluda Melayê Batê)



Ala Kurdî ya Xoybûnê ku me li Qamişliyê li cem Kurdekî dît ku wî jî ji Rewşen Bedîrxanê girtiye.

(Foto: Armanç)

Îşaret wehy-û telwîh û îradet vîn
û qudret şîn,
Ceman qels û betel merd û lîwa
ala, alem nişan.

(Ji Nûbara Ehmedê Xanî, 1651-1706)

Ala Kurdî ya îro

Gelo Ala Kurdî ya ku îro ji alî herkesî ve tê qebûlkin kengî, çawa û ji alî kî hatiye çekirin? Bi qasî ku ji belgeyên heyî tê fêmkirin di destpêka salên 1920'î de ji alî rêxistinên Kurdan ên wê demê hatiye çekirin û tesbîtkirin. Mesela wê wextê Kurdistan Tealî Cemiyetî li ser qerta huwîyetê ya komelê "zemîna wê kesk û li ortê ji rojek" alek Kurdî çapkirine ku ev al jî "Katîbê Umûmî yê komelê Zeynelabîdîn çekirîye" (1).

Li gor Zinnar Sîlopî (Qedîr Cemîl Paşa) ala Kurdî ya îroyîn ji alî Teşkilatî İctimaîye Cemiyetîyê hatiye tesbîtkirin ku şiklê wê weha ye; li jor rengê sor, di navîna wê de sipî, li ser sipî roj û li binî rengê kesk wek ala millî ya Kurdan tesbîtkirine û îlan kirine.

Her çendî di destê me de tu belgeyek din an jî rîsmek alê ya wê wextê tune, lê dîsa jî li gor gotina Zinnar Sîlopî em dikarin bibêjin ku Ala Kurdî ya ku îro ji alî herkesî ve tê qebûlkin di 1920'î de ji alî Teşkilatî İctimaîye Cemiyetî ya Kurdan hatiye çekirin (2).

Di 1921'an de Mistefa Paşa Yamûlkî li gel hin ji muessisên Teşkilatî İctimaîye Cemiyetî; Xelîl Rami Bedîrxan, Kemal Fewzî, Mewlânzade Rifat dixwazin biçin Kurdistanê Başûr, lê Îngilîz nahêlin ew derbas bin, tenê Mistefa Paşa Yamûlkî jî ber ku ji Silêmanîyê ye, derbas dibe. Mistefa Paşa diçe Silêmanîyê û di hukumeta Kurdî ya ku di

10.10.1922'an de di bin hukumdariya Şêx Mahmûdê Berzencî de tê avakirin, dibe wezîrê perwerdekarîyê (2). Her wê demê ji alî Şêx Mehmûd ve alek Kurdî hatibû qebûlkin û pûl jî çapkiribûn (3). Di destê me de ev al jî tune ye ku em bibêjin şiklê wê çawa bû. Lê ji ber ku Mistefa Paşa Yamûlkî yek ji muessisên Teşkilatî İctimaîye Cemiyetî ye ku şiklê ala Kurdî tesbît kirîye û di hukmata Şêx Mehmûd de ji bûye wezîr, û berpîşîyarê rojnama niv resmî ya vê hukmatê; Bangî Kurdistan, ne dîr e ku ala Kurdî ya dewra Şêx Mehmûd jî bi pêşniyara wî hatibe qebûlkin.


Rîsmê Ala Kurdî-1928

Ronakbîr û siyasetvanên Kurdan yê ku di salên 1900-1928'an li Kurdistanê û li Îstîbolê di nav komelê û cemiyetên Kurdan de karkirine an damezrandine, piraniya wan piştî salên 1925 û 1930'yî hatine li Sûriyê bi cih bûne. Her wê wextê jî bi navê Xoybûn rêxistinek avakirine. Ji weşan û kitêben ku wê demê li ser navê Xoybûnê derketine tê fêmkirin ku her ew ala ku di 1920'de hatiye tesbîtkirin, ji alî Xoybûnê ve jî hatiye qebûl kin.

Dîsa tê gotin ku di serîhildana Agrîyê de Îhsan Nûrî her ev ala Kurdî bi karanîye. Het-

ta rîsmek ku ji wê wextê maye, di gelek kovar û kitêban de hatiye belavkin.

Îhsan Nûrî bi xwe derheqê vê meselê de di bîranînên xwe de weha dibêje: "Di 1926 de Bro Heskî Tellî, ji êla Celalî li Çiyayê Agrî îşyan kir, xwe kîşa çiya. Di 1927 de nivîskar Îhsan Nûrî xwe bi Agrî gihand, idareya şoreş bi dest girt. Ji aliyê komîteyî Xoybûn qomiserê fewqeladeyî eskerî întixab bû (hat hilbijartin). Di wê salê de bayraxe sê rengîn a îstîqlala Kurdistanê ku di sala 1920 Cemiyeta Kurdistan Tealî qebûl kiribû, ji aliyê Xoybûn şandin Agrî, Îhsan Nûrî ewelîn car wê di Agrî de bilind kir".



Berga hejmarê yekem a bultena ku Kamûran Bedîrxan di 1948'an de li Parîsê derdixist.



Fotokopiya berga kitêba Sureya Bedîrxan

Lêkolîn

"...Min postekê esker ji xor-tên nebezê Kurda da çêkirin, ala Kurdistanê serbixoyî ra li qocên Agrî daçiqand.Pasevanên qaremanên Agrî ev ala ji dîr ve hurra dikişand. Lê wê çaxê li Agrî teşkilateke eskerî, idareyeke Kurdî hebû. Ala Kurdî bi pêl lê dida...." (Bîranînên Îhsan Nûrî, Hêvî (Kovara Çandî ya Giştî), Paris, No:2 (Gulan 1984), r. 21, 28)

Mesela di 1928'an de li ser qaxa kitêba Sureyya Bedirxan -ku ew jî yek ji xebatkarên Xoybûnê bûye- ala Kurdî bi rengîn hatiye çapkirin û li binê alê jî bi îngilîzî "Flag of Kurdistan" (Ala Kurdistanê) hatiye nivîsîn.

Di Gulana 1993'an de ez û ji redaksiyona Armancê, Mirze Bextiyar em çûbûn Kurdistanê. Li Qamişliyê li malekê, Kurdekî alek Kurdî nîşanî me da û got ku "Ev al ya Xoybûnê ye, li mala Celadet Bedirxan bû, min anî". Her çendî em ne pisporê qûmaş in, lê ji qûmaşê wê welê dixuya ku gelek kevn bû. Her weha me bawerî bi wî hevalî anî çimkî têkilîyên wî û Rewşen Bedirxan yên nêzik bi hev re hebûn. Me rismê wê alê jî kişand.

Kovara Hawarê û Ala Kurdî, 1932

Di Hawarê de li ser alê gelek nivîs û helbest hatine belavkirin.

"...Belê Şêxê min, min ji te re kefenekî welê bijarî ko hêj tu kelaş pê nehatîye pêçandin, min ji te re tirbeke welê koland ko hin tu mirî neketinê.

Min kefenê te kir: Sor, sipî û kesk û zer, ala te, û min tu veşartî nav rûpelên Hawarê û li serê wê kêla te daçikand.

Kefenê te kefenek welê ye, rûjkê bêt, ji te vebit li ser qelat û bajarên te re li pêl bibit. ("Şêx Ev-dirrehmanê Garisî çû rehetê", Hawar, No: 11(10.11.1932), r. 2-3)

Dîsa di Hawar, no: 5 (20 Tîrmeh 1932), r.4'an de Herekol Azîzan (Celadet Bedirxan) helbestek li ser ala Kurdî nivîsiye ku çend malik jê ev in:

Alê Kurdan

Ala Kurdan di nav rok
Çi bedew û bi heybet
Bi çar reng î, rengên te
Çi delal û çi xweşkok

Xêzek kesk û xêzek sor
Nav sipî û nîvek zer
keskesor e, bi roj e
Ev li jêr û ew li jor

Herekol Azîzan (b. Hawar, no: 5 (20 Tîrmeh 1932), r.4)

Di Hawar, no: 8 (12 Îlon 1932), r. 7 de Dr. Kamûran Bedirxan jî li ser alê helbestek nivîsiye û di malikên pêşîn ên wê helbestê de ala Kurdan weha tarif dike:

Ala Kurdan

Ronahiya dîl û çav,
Diyariya dê û bav
Pêşîra wê roj û tav
Spehitiya ax û av
Ala Kurdan ser be ser
Sor û gewr e kesk û zer.

(b. Dilê Kurên Min, Kitêbxana Hawarê, hejmar. 3, Şam, Çapxana Tereqqî, 1932, r. 25 û Hawar, no: 8 (12 Îlon 1932), r. 7)

Di çîrokeke Nureddîn Zaza de Ala Kurdî

Nûredîn Êsif (Nûreddîn Zaza) di Hawar, no:30 (1/7/1941), r.4-5 de bi navê Keskesor

çîrokek nivîsiye. Di çîroka xwe de behsa dewra Şêx Seidê Piran dike û qala dibistana xwe dike, paşê ku Kurd bi ser dikevin û ala Tirkî ji dîregê dadixînin û ala Kurdan hildidin jor ew jî li gel bavê xwe li ber derîyê serayê ye û paşê çîrok weha dom dike:

"...Xelk li dora serayê kom dibûn. Em zaro jî çûn; ew tiştê rengîn di ser serê me re sekinî bû. Lê ew ne keskesora ezmên bû. Min jê pirsî:

-Bavo ev çi keskesor e li ser serayê?

-Ev ala me ye kurê min! Ev şan û şerefa milletê Kurd e!


Pişt re li gor çîrokê, Kurd ji ber hin sebebên eşîrtî, nelise-rhevbûnê, serketina wan pir dom nake. Dijmin dîsa dikeve welatê wan, ala Kurdan ji dîregê datînin û çîrok weha dom dike:

"...Ala rengîn, şan û rûmeta me, çirandin avêtin ber lingên xwe, pêlê kirin û li sûna wê ya xwe, ya xwînwaran danîn..."

(Hawar, no:30(1/7/1941), r.4-5)

Li Mehabadê Ala Kurdî, 1946

Zinar Silopî (Qedrî Cemîl Paşa) derheqê Ala Kurdî ya Cumhuriyeta Mehabadê de weha dibêje: "Hukumeta Cumhuriyeta Mehabadê Ala Kurdistanê ya ku di 1919'an de ji alî Teşkilatî İctimaîye Cemiyetîyê ve hatibû



Bergê hejmara 11. a Hawarê (10.11.1932)

girtin, rengê te yê sipî nîşana dîlpakiya Kurda ye, rengê te yê kesk jî delîla ciwanîya axa Kurdistanê ye....."(4)

William Aegleton jî derheqê Ala Kurdî ya Mehabadê de weha nivîsiye: "Di Gulana 1944'an de rêxistina Komel, bi alîkarî û hevkarîya hevalbendên xwe yên li Iraqê, ala Kurdî ya milî hazir kirin. Ev al ku ji sê xetan pêkhatî bû, her xetek wê renek bû. Li jorê sor, li ortê sipî, li jêr jî rengê kesk cih digirt. Bi vî awayî bi ters qulubandineke rengên ala Îranê, ala Kurdî hatibû çêkirin. Li ser alê roj -ku sembola Kurda ye- û li kêleka rojê du simbilên genim, li pişt wan jî çiyayek û qele-mek hebû"(5)

"...Serê sibeha meha Çileyay Paşîn a 1946'an bû. Tav diçirîsî, rojeke xweş bû....Ji gundên dorê gundî û serok eşîr hemî hatibûn Mehabadê. Meydana Çarçirayê tijî bûbû. Cadeya ku ji herdu serîyên bajêr digihîşt Meydana Çarçirayê bi alên Kurdî û bi flamayên sor û sipî û kesk hatibûn xemilandin...."(6)

Musa Anter di bîranînên xwe de qala rêxistineke îlegal ku di salên 1948'an de li gel Yusif Azîzoğlu û çend Kurdên din danîne, dike. Di rêxistinê de sondek jî dixwarin. Ji bo sondê destê xwe datînin ser Ala Kurdî û çêkekê û sonda xwe dixwarin. Musa Anter jî bo vê alê weha dibêje: "Wezîfa çêkirina alê li ser min bû. Ez çûm Kapalıçarşıyê min her yek niv mîtro, min çar reng qûmaş kirin. Al îro jî tê zanîn. Sor, sipî û kesk, li ortê jî rojek zer. Sembola reng û roja li ser alê jî weha ye; Sipî, aşîti ye, sor, xwîn û şoreş e, kesk bereketa Kurdistanê û Me-

zopotamyayê ye. Roj jî sembola dîne millî yê Kurdan Zerdûştî ye...."(7)

Bulletin Du Centre D'Etudes Kurdes, 1948

Di bin berpirsiyariya Dr. Kamûran Alî Bedirxan de li Parîsê di navbera salên 1948-1950'yî de li ser hev 13 hejmarên wê derketine. Nivîsên wê bi Fransî ne, carna cih daye hin nivîsên Îngilîzî jî. Li ser bergê her hejmara wê ala Kurdî heye ku rengîn e. Sor li jor, sipî li ortê, kesk li jêr û li ortê jî roja zer (8).

NOT:

- (1)-Malmîsanîj, Bitlisli Kemal Fevzi ve Kürt Örgütleri İçindeki Yeri, Stockholm, 1993, r. 127, 129, 148
- (2)-Doç. Dr. Ergün Aybars, İstiklal Mahkemeleri 1923-1927, Ankara, 1982, r. 152
- (3)-Akis (Haftalık aktualite dergisi), no:11 (25 Aralık 1967), r. 24
- (4)-Behçet Cemal, Şeyh Said İsyanı, Sel Yayınları, 1955, İst., r. 89
- (5)-Zinnar Silopî, Doza Kurdistan, Beyrût, 1969, r. 60
- (6)-William Aegleton, Mehabad Kürt Cumhuriyeti 1946, Türkçeşi: M. Emin Bozarslan, 2. Baskı Komkar Yayınları, Köln, 1989, r. 94-95, 152
- (7)-Silopî, r.200, 203, 204
- (8)-Aegleton, r.94-95
- (9)-Aegleton, r.152
- (10)-Musa Anter, Hatıralarım, Doz Yayınları, İstanbul, 1990, r. 61-62
- (11)-Bulletin Du Centre D'Etudes Kurdes, No:1 (1948) - no:13(1950), Paris.
- (12)-Sureyya Bedirxan, The Case of Kurdistan Against Turkey, By authority of Hoyboon, Philadelphia, 1928.



Qadî Muhemed û endamên Komara Mahabadê di merasima hildana Alê de 15.12.1945

Celadet Alî Bedirxan di gotareke xwe de, di qismê behsa alê de ala me ya îroyîn tarif dike û weha dibêje: "Ala Kurdan, ji jor ber bi jêr ve, ser hev, sor, sipî û kesk e, di nava wê de roj diçirise. ("Welat, Welatîni û Al", Hawar, No: 9 (30 Îlon 1932), r. 1-2)

Rismê Ala Kurdî di 1932 'an de li ser herdu bergên Hawar, no:11 (10 Çiriya Paşîn 1932) bi reng hatiye çapkirin. Rengên wê jî sor li jor, li navendê sipî û li binî jî kesk, di ortêde jî tavek 18 tûrêjî (an jî stêrkek 18 niçikî) heye. Celadet Bedirxan her di vî hejmarê de li ser mirina Şêx Ev-dirrehmanê Garisî nivîsek nivîsiye û tede weha dibêje:

Çand û wêje

ARTHUR RIMBOUD



Demsalek di dogehê de

Berî çend rojan, eger ez ne şaş bim, jîna min ahengek bû, hemî dil tê de vedibûn û hemî rengên meyê jê diherikîn.

Êvarekê, min spehîbûn li ser çokên xwe rûniştand. -Min ew tirs dît- Min sixêf jê re dan. Li dijî dadperweriyê min xwe bi çekan rapêça.

Ez reviyam. Ey sihirbazno, ey renckêşan, ey zikreşî, min gencîneya xwe spartîye we!

Di nehiştina hêviya mirovî di ramana xwe de ez bi ser ketim. Bê mehrebaniyê, min êrişî xwe bir ser xweşiyê, taku wê bixeniqînim, min çemkirina bédeng ya sawira dirindane pêkanî.

Digel ku ez dimirim jî min gazî celadan dikir, ez dev li qontaxên livingên wan dikim, taku ez xwe bi qûmê û bi xwîné bixeniqînim, min gazî hemû nexweşiyên dikir. Renckêşan Xwedayê min bû, min xwe di herriyê de ramidand, min xwe bi bayê tewankariyê zuha kir, min şêfî bi lîskine seyr xapand.

Biharê kenê ê kawik, kenê ne xweş ji min re anî.

Lêbelê ez, vê dawiyê, ku ez dê henasa dawîn berdim, ez di lêgera li kilîta ahenga kevnar de ramiyam, ya ku belkî dilbijandina min li min vegeirîne.

Hezkirin bixwe ev kilî e -Ev îlham- ron dike ku min xewn didît.

((Tu ê keftar bimînî, H.D...)) Şeytanê ku min bi pîpnokên (xeşxaş) pir narîn serbitac kiribû, bang dike.

((De mirinê bi hemî dilbijandina xwe qezenc bike, bi ezîtiya xwe û bi hemî gunehkariyên mezin jî))

AX! Min ji pêdiviyên pirtir wergirt: -Lêbelê ey şeytanê minî delalî, tika dikim, de ka bibikek kêr hêrs bide min! Û di çavliêrmîna çend pîsiyên biçûk î dereng mayî de, hûn, ên ku ji tunebûna behreyên (qabiliyet) wênegirî û hînkirinê di nivîskar de hez dikin, fermo çend rûpelên kirêt ji deftera min. Ez ê ricimkirî.

Xwîneke pîs

Min ji bapîrên xwe ên giranbuha çavê şîn î sipî û mêjiyê teng û nezaniya şervaniyê wergirtine. Ez cilûbergên xwe di çêşnê barbarîtiya cilûbergên wan de dibînim. Lêbelê ez rûn di porê xwe nadim.

Ên giranbuha lawir digurandin û gîha disotandin, genîtirîn xelkên serdema xwe bûn...

Min pûtperestî û hezkirina gunehkariyê ji wan wergirtiye, ax! Û hemû ruswayî jî, tûrebûn, merdbûn -Çiqasî dilrevîn e merdbûn- bi taybetî derew û tirali.

Hemû pîşe min ditirsînin. Xwedankar û kirêkar, hemû cotkarîne bê rûmet in. Destê bi pênûs mîna destê bi gîsîn e. -Hey gidî ev çî serdema destperet e.- Hergîz dê destê min ne ji min re be. Wê gavê dîlîti ber bi dûr ve rêberiyê dike. Destpakiya parsê dilê min birîndar dike. Ên tewankar mîna ên xesandî her tiştî pîs dikin. Ez saxlem im, ew li ba min wek hev in.

Lêbelê! Ma gelo kê zimanê min kiriye mîna vê xapînokê, ku şîya ta vê qonaxê, rêberiya tiraliya min bike, herweha wê biparêze?

Ji boyî ku ez bijîm, bêtî ku ez laşê xwe bi kar binim, ji beqê tiraltir, ez li her cihî jiyam.

Hîç malbatek li Ewropayê nîne ku min ew nas nekiriye (mebesta min malbatên wek malbata min in; ên ku her tiştî ji bangnameya mafê mirovan wergirtine) Hîç kurê malbatekê nîne ku min ew nas nekiribe.

-dûmahik heye-

Çîrok

Hundirê odê bi ewrên wê roja buharî tarî bûbû û li derve xunaveke hûr dibarî. Bayekî hînik û xweş pêre dihat, bîhna axê bi xwe re tanî.

Pêşo, li ber pencera vekirî rûniştibû û li derve dinerî...Li xwe zivirî û bi jinbira xwe re axivî:

-Tu dibêji wê qîma xwe bi min bîne..?

-Ma keko wê ji te çêtir bi dest keve, wele lave dike!!

Bi nazî lê vegeand. Bi herdû destên xwe hevîr dikir..şopa tiliyên wê di wê hevîrî de xuya dikirin. Axafîna xwe domand:

-Wê bi xwe ji min re gotiye û ji daweta Miho ve, her roj behsa te dike..

Di ber re beşîfî û destê xwe yê rastê berda nav zerika avê û li hevîrê xwe reşand.., bû çepe-çepa lepên wê li ser wê hevîrî û bistirîna xwe domand...

Van gotinên dawî dilê Pêşo xweş kir, careke din berê xwe da pencerê û li derve nerî...

Bi wî bayî re û li ber wê xunava hûr, simbilên genim dihejiyan vî rexî, wî rexî diçûn û dihatin û xal ji wî genimî diçû, bi wê hejandinê re dilê Pêşo jî diçû û dihat, dixwest sema bike..û dixwest ji bo ku ew sema xweş be, ji dilê xwe re bistirîne.

Xweşbûna xuristê û dilşabûna Pêşo li hev rast hatin, wekî ku sozeke nependî di nav wan de hebe.

Careke din li xwe zivirî û li birayê xwe pirsî:

-Ka Qenco, li kû ye..?

RONO û sirûdên bêrîkirinê

Şebeng, xwelî-reng û toza AMÛDÊ

Yara min...!

Dema ku dem diherikî û li teniştî zîyanê dihenîjî, em dihatin û di zarermiya dav û torên temenekî bi tem û mûran de çeng dibûn. Bajaran dest bi hilbijartina xelkên xwe kiribûn. Ewrên xwe li bejna goristanên xwe dipîvan, sirûdên xwe bi nehênîyan, hevpeyivînen xwe bi kurtepiştê, birêveçûnên xwe bi westanê, dixemilandin. Bajaran siwarên xwe ji mehîna dîrokê re perwerde dikirin, zengo û zexme, liwane û rikêb ji bagerê re, ji kefa binçengê xweşmêran re amade dikirin. Bajaran, xewna me, lerza me yî sed ber ji bîr dikirin, mirina me, lîlandinên nivco û erênaya giyanê wêranbûyî ji ber dikirin!

Erê yara min...Bajarê me yî bê ba û jar, li ser duryanên şeva bêrûmet, li morîkên xwe û li nasnavêkî digeriya. Bajarakî şermezar û dilşikestî, ne li şebenga xwe ewle dibe, ne jî xwe li hêviya rêberên şewat û sinoran radigre. Bi rê diket, bi birêveçûnê diket, ne ha ji kulîmekên feleka xwe hebû û ne ha ji gûzek û çogên çarenûsa me hebû. Bi serîkî bê çav, bi lingên bê gav û bi devekî bê ziman li binguhê termê nermê (SAPARTO) diket. Xwe ji ber guve guva belgên rizyayî û ji ber simên taristana bêxwedîmayî, di tengerêyên bireweriyê de vedîşt. Piştî xwe dida dudiliya xwe û di (WAŞOKANÎ) de ji nû ve, bi yek

-Vê sibê Serxet bû, xeber hat ku apê we nexweş e, çû serdana wî...

Dilê Pêşo hat guvaştin, berê xwe guhert û çavên wî li tîlên sinor ketin...Li pey dextê li hemberî malê tîlên kambax zîç bûbûn..

Ev çî gundê li ser sinor e?...ji xwe re got û dilê wî careke din hate guvaştin. Lê belê nexwest ku wê xweşbûna berî kêlîkêkê wînda bike û xeyala wî careke din geriya...Riwê Nazê li ser wê merşa kesk mezin dibû û bi simbilan re dihejiya..û dihat ber çavên wî ku havînê piştî paleyiyê, wê dawet li dar be..heval û hogirên wî, wê wî bikin paşa, di şeva zavatiya wî de..û Nazê...Ax Naza minî delal...Ji nişkêve gurmênêk..dilê Pêşo hate xwar...Çokên wî sist bûn...Li jinbira xwe nerî, wê jî meyzand..Di çavên wan de tirseke mezin peyda bû.

Bê hemd dîsa li derve nerî, toz û dûman ji aliyê sinor rabû.

.....

-Kurê min divê ku tu jinbira xwe mehir bikî!

Bavê Pêşo jê re got..

-Yabo ez nikarim, ma kesekî xuşka xwe li xwe mehir kiriye..

-Û zarokên birayê te, bila sêwî li ber destê xelkê rabin..?!

-Bere li mala xwe bin ..zarokên me ne..

-Û namûsa me? Pîreka birayê te bibe jina hinekî din...Çawa namûsa mirov wilo erzaz be?

-Yabo ez nikarim jinbira xwe

binim, ez ê çilo, çawa biçim ser nivîna birayê xwe..?? Ma kesî ditiye...!!!?

-Law; ev adetên me kurmanca ne, bi hezaran wilo jinbirên xwe anîne..

-Kê kiribe jî, ez bi xwe nikarim bikim..

Bêhna bavê wî teng bû û bi tundî jê re got:

-Eger ku tu jinbira xwe mehir nekî, ne tu kurê min î û ne jî ez bavê te me..

Pêşo serê xwe kire ber xwe..bav rabû ser xwe û derket..

.....

Şeveke havînê ye, stêrk li ezmana diçirsin...Û zewaceke bédeng dike ku cî bigre...

Pêşo li oda birayê xwe rûniştîye.. û cixarekê ji yekê pêdixê..ji nişkêve, jinbira wî derbasî hundir bû.. ne cilên bûkaniyê lê ne, ne jî dihnê zavan li Pêşo dikeve..

Pêşo serê xwe ranekir..û hêdî hêdî hêviyên wî yên dawetêke xweş û zewaceke bi dil herifîtin...Riwê Nazê û jinbira wî, bav, bira...tevlî hev bûn..ramanên wî li hev ketin...da xwe û ji kel rabû li devê dêrî da...

Jinbira wî bi dilekî şkestî rûnişt..û ponijî çend kêlî pêve çûn..û gurmênêk hat...Hema perda pencerê hilda...Stêrkek ji esmana hate xwar, rijîya...

Rondikek bi melûfî bi ser hînakê riwê wê de herikî...

Kamîran Haco

□ Ehmed Huseynî

de vedigrî. Lê hê jî em bi hêvîn e ku rojekê dê çîrên kevnar di çavên te de vêkevin. Lê hê jî em xwe haş dikin, em kevîrêkî ji welatên biyaniyê dixin ber dilê xwe û ji xwe re, ji qaza zarotiyê re dibêjin:

-Dê keskesor di gerdana te de rengan binimîne. Dê sira bayê di pêşênîka te de gulan bicivîne. Dê agirê nava me dîroka te bi dilokan bikelîne. Dê xewna dirindane xencera te yî sîkîrî di qurçîka şevê de daçikîne!!

Erê yara min!!

Wî bajarê malşewitî em xapandin!

Ku bîriya te dikim û bîriya maçîkirina destê pîremêr û pîrejînan dikim, ku bîriya bédengiya kêlan û tengerêyên laşê goristanê dikim, digirîm!

Ne ba wek bayê we ye, ne av wek ava we ye, ne nan wek nanê we ye, herweha ne xelk û ne jî dimênên rojê...

Ku bîriya te û marmaroka li dor çira hewşê, bizûza ku hildiperikî koşeya odê, bilaçemka ku carcaran semageriya xwe ji bîr dikir, hêlîna hehecîka li hêwanê, dikim, digirîm.

Ku bajarê we di himbêza min de çavan dikutukîne, ku şebenga zarotiyê hogirî birtûjiya hest û wîcdan dibe, ku xwelî-reng hogirî nazikî û dilrevîniya rengê gulan dibe, digirîm. Ku digirîm toza "Amûdê" li ser pelên dil û li ser gihayê lêvan giran dibe...

Salvegere 100'em ya jidayikbûna Mayakovskî

"Dayê! Birano! Hevalno! Li min bibûhurin! Diyar e ku ji bilî xwekustîne tu tiştekî dîtir li gel min nedigunciya"

Mayakovski

Kurtejiyana Mayakovskî

□Suleyman Demîr

Vladimîr Vladimiroviç Mayakovskî di 19'ê Tirmeha 1893'an de li Gurcistanê li bajarê Bagdadî ji malbatekê ûris hatiye dinê. Bavê wî karmendekî biçûk yê daristanê bû û ji bilî Mayakovskî du keçên wî jî hebûn. Piştî ku bavê wî sala 1906'an dimire, malbata Mayakovskî bar dike, Moskovayê.

Mayakovskî hîn xortekî pir ciwan bû li Gurcistanê bi alikariya xuşka xwe ya mezin fêrî ramanên şoreşgerî bû. Loma jî li Bagdadî bala polisên Çar zû kişandibû ser xwe. Piştî ku bar dikekin Moskovayê, xurtir bi siyaseta mijûl dibe. Di dawîya sala 1907'an de bi Bolşevîkan re dixebite. Sala 1909'an sê cara tê girtin. Piştî ku Çileyê Pêşîya sala 1910'an ji zindanê derdikeve pêwendiyên wî bi partiya Bolşevîk re sist dibin û bala xwe pirtir dide ser resamiyê. Sala 1911 dikeve akademiya wêne û heykel.

Helbestvanî di jiyana Mayakovskî de bûyerekek kevinîr e. Lê di demeke kurt ya xortaniya xwe de ji nivîsina helbestan bi dûr ketiye, heta ku di destpêka xwendina xwe ya bilind de bi helbestvan, David Burljuk re dibe heval. Dema Burljuk helbestên wî yên kevin dixwîne, dibêje "tu helbestvan î" "ev baş in" û jê daxwaz dike ku di binivîsina. Burljuk dike ku bawerîyeke mezin di derheqa helbestvanîyê de li ba wî peyda bibe û Mayakovskî xwe ji nû ve dide nivîsandina helbestan.

Mayakovskî di destpêka helbestvaniya xwe de di bin bandora Aleksandr Blok de bû. Ji 1912'an pê de wî û çend hevalên xwe dest bi parastina rastîya Futurizmê kirine. Sala 1913-1914 ji bo ku xwe û Futurizmê bidin naskirin ew, Burljuk û Kamenskî derdikevin gerê; li meydana gelek bajaran helbestên xwe dixwînin û propaganda dikin. Ji ber vê sedemê jî Mayakovskî û Burljuk ji dibistanê tên avêtin.

Mayakovskî wek helbestvan bi helbesta xwe ya "Ewrekî Di Şal De" hat nasîn. Dema M. Gorkî cara yekem li helbestê guhdarîkirîye, gelekî pesinandiye û ji kêfa girîyaye. Û M. Gorkî heta mirina wî, dostê wî maye.

Dem a Mayakovskî û xuşka Lîlî ya biçûk Elsa heval bûn, wî û Lîlî çend cara jî dîr ve hev dîtibûn, lê evîndariya wan sala 1915'an dest pê dike. Mayakovskî Tirmeha sala 1915'an bi Elsa re li mala Lîlî û mîrê wê Osîp Brik dibe mêvan. Ew helbesta ku pê nav û deng da, *Ewrekî Di Şal De* li wir ji wan re xwend. Wê şevê li wir dil dikeve Lîlî û helbesta xwe diyarî wê dike.

Lîlî di derheqa wê şevê de wilo dibêje: "Mêrê mi Osîp... Qet bawer nedikir. Tiştekî wilo nedîtibû... Osîp deftera Mayakovskî jê girt û heta dawîya şevê paşde nedayê. (...) Dûvre Mayakovskî defter jî destê Osîp Maksimoviç girt, danî ser masê, rûpelê pêşî vekir û ji min pirsî: "Tu destûrê didî min ku ez helbestê diyarî te bikim?" û li jora helbestê bidestnivîseke xweşik wilo nivîst: *Ji Bo Te Lîlî Jirjevna Brik*".

Lîlî di jiyana Mayakovskî ya şexsî û helbestvanîyê de rolek mezin leystiye. Lîlî bûye stûneke bingeîn a sedema serketina nivîskariya wî.

Evîndariya xwe sê sala hinekî vaşartî hiştine, lê ji 1918 û pê de eşkere wek jin û mîr jiyane.

Di sala 1922'an de pêwendiyên Mayakovskî û Lîlî wek jin û mîr sist dibin û paşê hevdu berdin. Lê bi vî berdanê hew pêwendiyên wan wek jin û mîr qediyane. Mayakovskî bi dî Lîlî re hevalû bi jinên din re jî kirîye. Lê dostani û hevaltiya wî û Lîlî her dom kirîye. Sibeha 14'ê Nisana 1930'an, hevala wî ya dawî Veronika Po-

Dûmahîk r. II



Ewrekî di Şal de*

Ji bo te, Lîlya

Destpêk

Li ba min bêrîkirina xurifandinê nîne
û di giyanê min de porê sipî şîn nabe
Min dinya bi qerînen xwe hejand
va ye ez hatim- xortekî spehî û bîstûdu salî.

I.

Hestdikim

Ku "ez"

ji bo xwe pir biçûkim.

Yekî ku rê di min de lê teng e

û naxwaze raweste heye.

II.

Em yên nûjen

bi komên mezin pêşde dirin

qet guhdar nakin

emê wan ên wek bîlaga belaş

xwe bi nivînen cot ve asê kirine

teva bi qulipînin.

Ew sirûda ku wek êgir bi gurîni
ji febrîqe û labîratîwara bilind dibe
me bi xwe çekirîye.

Guhdarbikin!

Ji xwe re bibihîzin

bê Zerdestê ve demê çî dibêje

bi nalîn û hewar xwe di erdê dide.

Ew pêxemberê gazî dike ez bixwe me,

çi dera êş û kul lê hebe ez li wir im

Çi li ba hêsira ku dibare

min xwe pê ve li çarmixê xistiye.

Efûkirin li vir xelas bûye.

Li wê dera ku demekê dilovani hatibû çandin

min ruh li wir kirin bax û bexçe.

Ev diwartir e ji êrîşkirin û hilweşandina

nema zanim bê çend hezar La Bastille'a.

Û dema rêber bi anonsa serhildanê hat-

ezê ji we re

Danê xwe ji singa xwe biqetînim

û pêlê bikimê

heta ku mezin bibel-

û wek alek bi xûn diyarî we bikim.

wergera ji Swêdî: Suleyman Demir

* Beşek ji helbesta "Ewrekî di Şal de" ye.



Weşanên Nuh



Amadekar: Rohat

Mehmet Bayrak, *Kürtler ve Ulusal Demokratik Mücadeleri* (Kurd û Têkoşî-nên Wan yên Netewî-Demokratîk), Weşanxana Özge, 670 rûpel, Enqere, 1993.

Di nav rûpelên vê pirtûka berfireh de gelek dokûment, lêgerîn û notên li ser tevgerên Kurdî cîh girtine. Ji van çavkaniyan gelek ji zimanê Osmanî hatine wergerandin û bi Tirkîya îroyîn ve çap bûne. Bi taybetî derheqa serhildana Şêx Seîd de zaniyarî û agahdariyên fireh tên dayin. Di dawîya pirtûkê de çend sûret, wêne û şiklên dokûmentên dîrokî cîh girtine.

Mehmet Bayrak

KÜRTLER
VE
ULUSAL-DEMOKRATİK
MÜCADELELERİ



Mesut Fanî, *Kürtler ve Sosyal Gelişimleri* (Kurd û Pêşketina Wan ya Cîvaki), Weşanxana Tanmak, 108 rûpel, Enqere, 1993.


Ev lêkolîna sala 1933'an de li Parîsê bi navê La Nation Kurde et son évolution sociale çap bûye û wek xebateke doktorayê hatiye amadekirin. Di pirtûkê de Kurd bi giştî tên nasandin, li ser ziman, dîn, dîrok û kok û wan tê sekinandin. Pirtûk ji aliyê Prof. Dr. Azmî Süslü de hatiye wergerandin û deh hezar



heb hatine çapkirin.

Yaşar Kaya, *Gündem Yazıları* (Nivîsên Gündemê), Weşanxana Belge, 200 rûpel, Îstebol, 1993.

Yaşar Kaya ev nivîsên xwe yên ku di rojnama Özgür Gündemê de dem-dem çap bûne, di vê pirtûkê de gişkî gîhandine hev, wek pirtûk amade kiriye. Yaşar Kaya ji der serokê Partiya Demokrasiyê, wusan jî xwesiyê ve rojnâme ve, wek ronakbîr û rojnamevanekî Kurd tê nasîn. Yaşar Kaya, di van nivîsên xwe de, bi taybetî angorî zanyarî û bûyerên dîrokî, li ser rewşa Kurdistan ya îroyîn disekine.



İslam Düşüncesinin 20. Asırda Yeniden Yapılanması ve Bediüzzaman Said Nursî (Di sedsala 20'an de ji Nû ve Pêhatina Ramana İslamî û Bediüzzaman Saidê Nûrsî) Weşanxana Yeni Asya, 300 rûpel, Îstebol, 1993




Di vê pirtûkê de, çend rapor û nivîsên ku li ser Seîdê Kurdî (Nursî) hatine amadekirin, cîh girtine. Çawa tê zanîn di rojên 27/29.9.1993'an de li Îstebolê li ser vî mezinê Kurd cîvîneke berfireh û navnetewî hatiye pêk anîn. Hemû rapor û nivîsên ku di vî cîvînê de hatine pêşkêşkirin û carê pirtûk hatiye amadekirin. Dîtin û baweriyên gelek pisporên ku li ser Seîdê Kurdî xebatên wan hene, di vê pirtûkê de cîh girtine, wek

Şerîf Mardîn, Anna Masala, Ursula Spular...

Yaşar Kemal, *Yaşar Kemal Kendini Anlatıyor* (Yaşar Kemal Qala Xwe Dike), weşanxana Toros, 205 rûpel, Îstebol, 1993.

Yaşar Kemal di vê pirtûkê de bi dîr û dirêj bersivên pirsên helbestvan û nivîskarê Fransî Alân Bosquet dide. Pirtûk bi metoda pirsbersivî hatiye amadekirin û wek pirtûkeke hevpeyvînê jî dikare bê nav kirin. Ev pirtûka cara pêşîn li Fransê bi zimanê Fransî di sala 1992'an de çap bûye. Derheqa Kurdistan de çend zanyariyên kêrhatî jî, di pirtûkê de cîh girtine.



KİTABÊDO NEWE:

TAYÊ KILAMÊ DÊRSÎMÎ

"Bira, pêro de, na qewxa aşîre nîya
Merevê Kirmancan û zalimanê Tirkan o."

(Kilama "Derê Laçî" ra)

"Bira, Mistî fermanê Dêrsimî veto
Do ra destê teresê Celal Bayarî.
Bira, kardî arda wertê Dêrsimî
Zalim onceno jê mal û gayî.
Axlerê koyê Dêrsimî qir kerdî, qedênayî;
Fîqarê ke verê dêsû de mendî
Kerdî makîna hokmatî, vor de rusnayî.
Hokmatî kerdî makîna, vor de rusnayî."

(Kilama "Ya De Dîna" ra)

Yeno mi vîrî, tanî merdîmanê nezanan ê ki xwi zanaye hesibnaynî, vatîni "Kirdkî (Kirmancî, Zazakî, Dîmilîkî) di deyîrî (kilamî, lawikî) çinî", "Kirdî (Zazay) nêzanî deyîrî bikî". Gama ki mi ti ra vatîni, "Şima şaş î, Kirdkî di deyîrî estî, him zî zaf î", mat mendîni. Dima, gama ki roj bi roj deyîrê Kirdkî nusiyay û deyrbazan (dengbêjan) bandan di nê deyîrî vatî, wendoxan û goştaritoxan fam kerd ki zey lehçeyanê Kurdkiyanê bînan Kirdkî (Zazakî) zî wayîrê deyîranê zafan a.

Nê çend serranê peyenan di folklorê Kirdan ra tanî nimûneyê erjaye kom bî. Niyan ra tanî, gazeteyan û kovaranê Kurdan di nusiyay, tanî kitabên di neşrbî. Nê rojanê peyenan di zî kitabêdo Kirdkî (Kirmancî, Zazakî) vejîya. Nameyê nê kitabî "Tayê Kilamê Dêrsimî" yo.

"Tayê Kilamê Dêrsimî" di xezîneyêda erjaye ya folklorê Kurdanê Dêrsimî pêser biya. Nuştux Mûnzûr Çemî no kitab hazir kerd. Ez wendoxan vîrî fina ki Mûnzûr Çemî ebi namebê H. Toprak, Ahmet Taş, B. Şilan, Mirzali Çimen, S. Dilan'î zî nuşte û kitabî nuştî (derheqê bîyografiya kilm a Mûnzûr Çemî û namey kitabê yê di qapaxê peyenê nê kitabî ra biewnî). Yê par bi namebê "Hotay Serra Usifê Qurzkizi" kitabêdo Kirdkî (Zazakî) vetbi. Şima mi persî, wendoxê ki biwazê derheqê Kurdanê Dêrsimî û Terteley Dêrsimî yê serra 1937-1938'î di wayîrê zanayîşî bibî, ganî nê her di kitabên zî biwanî. Bi kitabê xwi yê newî "Tayê Kilamanê Dêrsimî", Mûnzûr Çemî kutubxaneyê Kurdan rê û bi taybetî zî kutubxaneyê lehçeya Kirdkî rê xizmetêdo gird (xişn) kerd. Ez hêvî kena ki meştî zewbî xebatê insarênî zî bibî û xezîna kulturê maya nimîta hîna weş vejîya raste. Merdimê ma çende ki kulturê xwi bişinasnî, mezgê yîni do ehende roşney bivîno, ê do ehende tesîrê propaganda dişmenê kolonyalistî ra dîrî bikewî, xwi ra bawer bibî.

"Tayê Kilamê Dêrsimî" çar qismî yo: Qismê verînî di "Kilamê Ke Lezê Aşîran Ser o



Qapaxê kitabê Mûnzûr Çemî, Tayê Kilamê Dêrsimî

Amê Vatene", qismê diyinî di "Kilamê Ke Meselanê Wertê Dêrsim û Dewlete Ser o yê", ê hîrîni di "Kilamê Ke Heskerdene (Eşqî) Ser o Amê Vatene", ê çarîni di zî "Kilamê Ke Meselanê Bînan Ser o Amê Vatene" estî. Nê kitabî di pêsero neway û hewt kilamî estî û ci ra (ti ra) vîst û yew hebi ebi varyantan î, tanî ebi di tanî zî ebi hîrî varyantan. Bêguman semedê nuştîş û hazirkerdişê nê neway û hewt kilaman ra arêkerdixî kedêda vêşî xerc kerd.

Kitab di, nê kilaman dima ferhengêkêdo (sözlük) Kirdkî-Kirdkî (r. 281-317) yanî Zazakî-Zazakî esto. Mûnzûr Çemî ebi nê karî zî xizmetêdo baş kerd. Kirdkî-Kirdkî biyayîş, nê ferhengêkî hîna erjaye keno.

Kilamanê qismê verînî di, wezîyet û tîkiliyanê 'eşîranê Dêrsimî ser o, qismê hîrîni di heskerdiş, zerri devistiş (zerri pira naye), zerrîtenikek û hessaseya şarê Dêrsimî ser o nimûneyê kilamanê weşan estî.

Hetê tarîxî ra kitab di qismo hîna muhîm qismê diyin o. Nê qismî di deyîrê lejî (lezî, pêrodayîşî) yê ki qala cengê Kurdanê Dêrsimî û Tirkan yan zî Orrisan kenî, estî. Ebi nê kilaman yewna parçey tarîxê ma roşn beno. Nê kilaman di merdim him xayînan, bêbextan, milîsan him zî qehremananê Dêrsimî şinasneno.

Nê kilamî zî nawnenî (misnenî) ki Kurdanê Dêrsimî, qehremanê ma yê zey Şahan Axa (Şahan Axa) (r. 154-158), Sey Usenê Sêydî (r. 159), Îvis (r. 162-169), Hemê Cîvê Kêjî (Hemedê Cîvraîlî) (r. 163, 165), Qemerê Hesenî (r. 163, 165), Hesê Kalî (Hesenê Kalê Goncî) (r. 163, 165), Xidê Alê Îsme (r. 192-196) û ayê bîni xwi vîr a nêkerdî.

Arêkerdixî tembeley nêkerda, tena kilamî pey yewnan di rêz nêkerdî. Ebi îzehetan û notanê binênan (dipnotlar) kitab hîna pê (zengîn) kerd. Îzehetê ki Mûnzûr Çemî derheqê nê kilaman di day û notê binêne ki kitab di yê, karê wendoxî asan kenî. Çimkî nê Îzehetî û notî, him derheqê binkeyê vejîyayîşê nê kilaman di him zî derheqê tanî cayan û nameyanê ki kilaman di vîrenî di me'lumat danî. Saya nê îzehet û notan di hinî nê kilamî abstrakt (mucerrred) nêmanenî, benî konkret (muşexxes).

Kitab di tena kilamê ki vatoxê yîni nîno zanayîş yanî tena kilamê anonîmî ca nêgênî, çend şîrê şairanê namedaranê mintîqa Dêrsimî yê ki ewro kilamî (zê kilamî ebi meqam) vajîyênî zî kitab di estî. Şîranê şairê lehça Kirdkî (Zazakî) ra Sêy Qazî (r. 124-136) nimûneyê nê tewir şîran î.

Çend kemaneyê nê kitabî zî estî. Mesela "şaşeyê çapî" (xeletyê metbe'a) tede zaf î. Şaşeyê inasarenî hîna vêşî Ferhengêk di estî. Baş ki Mûnzûr Çemî yew cetwelê şaşan viraştî û te de şaşeyê muhîmî rast kerdî.

Kalîtey çapa (baskî) kitabî û cildê yê zî baş niyo, merdimî ki çend ray wend û xwi dest di çama, vînenî ki perrê yê cêser kewtî û dirriya.

Labelê ebi kemaneyanê xwi zî no kitab erjaye wo û layiqê wendişî yo. Eke kitabê inasarenî welat di çap û vila bibî (neşr bibî) do tesîrê yîni hîna vêşî bibo.

Malmîsanîj

BARBARA

Xwi vîrî biyari Barbara
Varan varaynî ay roj bêvind Brest di
Û ti rayîr ra şîynî ebi peşmiriyayîş
Kêfweş, zerweş, hîy û şelpaya
Binê varanî di
Xwi vîrî biyari Barbara
Varan varaynî ay roj bêvind Brest di
Û ez raştê to ameya kuça Siam di
Ti peşmiriyaynî
Û ez zî peşmiriyaynî
Xwi vîrî biyari Barbara
Tiya ki mi ti nêşinasnaynî
To zî ez nêşinasnaynî
Xwi vîrî biyari
Xwi vîrî biyari girana ay rojî
Xwi vîr a meki
Yew camêrdî xwi dabi binê ortmî
Û ebi qîrrayîş namey to va
Barbara
Û ti ver bi jey vazdaya binê varanî di
Hîy û şelpaya, kêfweş, zerweş
Û to xwi vist verika jey
Xwi vîrî biyari aya Barbara
Û mi ra mecigîre eke ez to ra vana "ti"
Ayê ki ez tira hes kena ez hemîni ra vana "ti"
Wazeno wa ez yew ray vêşê jîni nêveya zî
Top ayê ki yewnan ra hes kenî ez hemîni ra vana "ti"
Wazeno wa ez jîni nêşinasna zî
Xwi vîrî biyari Barbara
Xwi vîr a meki
Nê varanê mulayîm û dilşay
O ki rîyê to yê dilşay ser o
Nê şaristanê dilşay ser o [vareno]
No varano [ki] deryay ser o
Tersanî ser o
Gemîya Ouessantî ser o

Ex Barbara
Çi ehmeqey a ceng
Se biya ti nika
Binê nê varanê asinî di
Adirê polay û gonî di
La ay camêrdo ki ti polanê xwi miyan di şidênaynî
Ebi heskerdiş
Tirê merd, vîni bi yan hema ganî yo?
Ex Barbara
Varan vareno bêvind Brest di
Verê senî varaynî ayhewa
Labelê sey verî niyo hinî û heme çî mahî biyo
No yew varanê 'eza yê afatin û deydayox o
No hinî firtiney asin, polay û gonî zî niyo
Tik û tena hewr î
Yê ki sey kutikan ganî danî.
Kutikê ki [orte ra] cim benî
Brest di awan ver o
Û şonî durî helisîyênî
Bresta ki te de çiyekî nêmeno ra durî
Zaf durî.

Jacques PRÉVERT
Frensîzkî ra tadayox: Bengîn ROŞN

cim biyayîş: vîni biyayîş, vîndî biyayene
deydayox: mehzûnkerdix, çîyo ki merdim te de dejenî,
çîyo ki hin keno ki merdim çîna ver keweno
derya: dengîz, behr
'eza: hezn, yas

destpêk: r.3

Îro avakirina cepheyekê...

istinên din ên Kurda -bila ji sê, yan jî ji hezar kesî pêk bîn- re hurmet bike daku ew jî tolerans û hurmeta wan qezenc bike. Ku mirov ne xwedî tolerans û hurmetê be, ji îro ve qedera cepheya ku bête avakirinê xuya ye û bi qeneata min wê bi ser nekeve.

Di pergela nû ya dinê de helkirina pirsên navnetewî bi giraniya DYA, Brîtanya, Fransa, Almanya û Japonyayê dibe. Rola wan a di pergala nuh de pir girîng e û xuya ye, bêtî dilxwaziya wan helkirina pirsan ne mimkun e. Ku em ji vê rastiyê hereket bikin, rêxistinên Kurda bi tevgera xwe ya avakirina cepheyek bi PKK'ê re xwe dixin nakokiyek gelek dijwar. Eger ez tenê xwe pêşandanên li Stockholm, London û Bonnê wek nimûne bidim, ez di wê baweriyê de me ku xwendevan wê fêhm bikin ka ji bo çî çapemeniya Ewropayê bédeng man û tu eleqe nîşan nedan. Ne televizyonên wan û ne jî rojnameyên wan cih nedan meş û xwepêşandanên li her sê bajaran. Sebeba vê yekê xuya ye; mohra "teroristî" ya li ser PKK'ê. Icar berê ku mirov bi PKK'ê re cephe çêke divê PKK bi her awayî hewl bide xwe ku vê mohra negatîf ji ser xwe rake. Na ku bi vî awayî dom bike

tirsa min ew e ku navên rêxistinên din ên Kurda jî negatîf derkeve û dostaniyên heya îro hatine qezenckirinê ji holê rabîn.

Em werin ser niyeta hikûmeta Tirkiyê; hiç şika min jê tune ye ku "mohra teroristî" gelek kêrî dewleta Tirkiyê tê. Dewleta Tirkiyê vê mohra nebaş bi her awayî bi kar tîne û bi gotina "rêxistinên terorist" niyet her kirêtkirina tevgera gelê Kurd e.

Gelê Kurd hewcedarî partiyên din e jî. Partiyên ku îro dixwazin di cephekê de cih bigrin divê berî her tiştî hewl bidin xwe û rêxistinên xwe yên li hundirê welêt xurt bikin. Ku ev neyê kirin ji bo gelê Kurd alternatîf gelek kêrî dibin û neîca vê yekê jî pir xeter e. Tirsa min ew e ku partiyên din di nav cephê de -ji ber ku li hundirê welêt jî alî rêxistinî ve hêj negihîştine seviyeke baş û qewî- bihelin û gelê Kurd bê xwedî bimîne.

Bi ya min jî dêlva ku mirov bi hev re cepheyekê ava bike mirov dikare bi awakî tekûz û îlankirî dest bi xebata siyasî bike, diplomasiya xwe xurt bike û hewl bide ku qenaata negatîf biguherîne, qenaata pozîtîf.

Salvegera 100'em ya ji bo dayikbûna...

lonskaya, leystikvana şanoyê, dike here kar, lê Mayakovskî jê daxwaz dike ku li malê bimîne. V. Polonskaya xwe ji nav destên wî difiliîne û derdikeve der. Hê negihîştîye berderiyê derve, dengê demançê jî hundur tê. Mayakovskî xwe kuştibû.

Mayakovskî ji 23 saliya xwe pê de çend cara kiribû ku xwe bikuje: Gulleyek dikir demançê, gindorê wê difitiland û digot ku pêwîst be ez bijîm jixwe nateqe; dikir serê xwe û nikê wê dikişand. Çend cara xelas bibû. Lê cara dawîn xwe bi rastî kuştibû.

Mayakovskî çima xwe kuşt? Ev hûna tê muneqaşe kirin. Gelek tişt hatine nivîsan-din. Bê guman gelek sedem hebûn. Lê tê gotin ku sê sedemên bingehîn ew hêdî hêdî gihandin kuştinê.

Mayakovskî jî extîyariyê pir ditirsîya. Li gor wî ji 30 salî pê de extîyarî bû.

Ew û Lîlî ji hev veqetiyabûn, lê heta wê bistika xwe kuşt ji agirê evîna Lîlî wek agirê hêlûnekê di dilê wî de rivîn dida. Wek jin wendabûna Lîlî ji jiyana wî, nedihate qebûl kirin. Lîlî ji bo wî ne jin û heval tenê bû, sedema xweşiya jiyana wî û kaniya xîreta nivîskariya wî jî bû. Lîlî ew xweşt û hêviya jiyana tev bi xwe re biribû, hêminî û hedana wî qediyabû. Her ku diçû êşa tunebûna wê ji bo Mayakovskî girantir dibû.

Mayakovskî wek helbestvanekî şoreşger tu giramî ji hukûmetê û partiye negirtibû; berhemên wî baş nehatibûn nixrandin. Ji bona ku berhemên wî negihîn xwendevanên wî, gelek cara wî li ber dihatin girtin. Nivîskarên din yên ku navê proleter li xwe kiribûn, ji bedêla rexna, di nivîsandinên xwe de ew biçûk dixistin. Ev yek bibû wek helwesta resmî li hember wî. Çi dikir ev helwest nedihat guhertin. Vê helwestê dikir ku Mayakovskî her roj çend cara bimre.

Mayakovskî hew 37 salan jiya, lê wek yekî ku pir dirêj jiya be kar û şer kirîye, berhemên giranbûna hiştine. Berhemên ku Mayakovskî di van salan de pê re gehîşt ku binivîse. 13 cildên qalîn da-digirin.

Şano û senaryo di nivîskariya wî de ciyê duwemîn digirin. Di şanoyên xwe de rola serekî bi piranî wî bi xwe leystiye. Filmek jî çêkirîye, lê film dî re wenda bûye. Çend cara kirîye romanekê binivîse lê nebûye. Ji bo serketina Leşkerê Sor û şoreşê di nav salên 1919 -1922 de wek berpirsiyarê propaganda û ajîtasyonê ye

daîra telgirafê dor 600-700 afîş çêkirine û li ser wan afîşan kurte helbest nivîsine. Di nav salên 1923-1925'an de bi hevalên xwe Babel, Zoşçenko, Meyerhold, Pasternak, Şostakovîç û Ayzenshtayn re kovara LEF derxistîye û redaktoriya serekatî kirîye. Çûye Fransa, Emerîka û Meksîkayê û konferans dane. Berhemên wî yên bi nav û deng, *Ewre Di Şal De*, *Di Derbar-e-yî Wîlo De*, *Heta Deng Hebe Qêrin*, *Destana V.I. Lenîn*, *Mîsterya-Buf*, *Keçika Ciwan û Yê Tewtewe* ne. Pir helbest û tiştên ku negihaye bi dawî bîne, îro nivco ne, hene.

Mayakovskî bi riya kovara LEF (Enîya Hunermendîya Çep) û dûvre jî LEF a Nû bû karibûye berhemên xwe bigihîne xwendevanên xwe û bersiva wan nehoqiyên ku lê dibûn, bide. Di derheqa helbest û hunermendîyê de şerekî hişk bi derdora kovara Oktober ya RAPP (Yekûtiya Nivîskarên Proleter yên Rusya) re kirîye. Li gor wî, piraniya kesên ku li dora RAPP civiyabûn, durû bûn, nezanê nivîskarî û hunermendîyê bûn, tirsonek û derewîn bûn. Ev şer, bû sebeba ku tadhîyên siyasî li Mayakovskî bibin, berhemên wî neyêne xwendin û ew bi xwe jî tenê bimîne. Wek mirov û helbestvan, wî û mirovên dema xwe li hev nekirin, lê xwedî hêviyeke pir bilind bû ku mirovên pêşerojê, wê wî û helbestên wî fam bikin. Bawer bû ku wê helbestên wî demên pir dirêj jî nûjentiya xwe tişteki wenda nekin, di pêşerojê de baştir bêne nixrandin û hez kirin. Loma jî di piraniya helbestên xwe de gazî mirovên demên bê dike.

Mayakovskî di helbestên xwe de du tema bi kar anîne: Evî û pirsên civakî. Di helbestvaniya xwe de di nabêna herdu tema de çûye û hatiye; pir cara herdu tema bi hev re bi kar anî ye. Di helbestvaniyê de hêleke serketina Mayakovskî ew ku karibû van herdu tema bi hev re bi kar bîne.

Li gor Mayakovskî "divê helbest wek buharê azad be, wek çemekî bi xuşîn biherike, rast be û bi naveroka xwe wek rîsas be". Helbestvan, divê di jiyana de jî serek be". Mayakovskî helbestvanî jî nû ve li ser van bingehên asê avakirî û diyarî mirovantiyê kir. Ev nûjentiya di helbestê de ji bona Aragon, Nazim, Neruda û pir helbestvanên navdar yên bi dî wî re bûye ronahî.

Dîgor, Malazgîrt, Gever...

ji hovîtiya Sedam ya li Kurdistanê Iraqê bibu-hurînin.

Lê mixabin dewlet di taktîka xwe de bi ser di-keve. Van pênc salên daw-iyê bi sedhezaran gundiyan

ji gundan koçî bajaran, her-weha bi sedhezaran kes jî ji bajarên Kurdan koçî bajarên Tirkiyê kirine. Ev rastiyek e û divê ev rastî bê dîtin. Hêzên Kurd divê êdî muha-sebekê bikin, rewşa heyî,

taktîk û awayên têkoşînê, duh, îro û sibêya xwe bidin ber hev. Jê encaman derxin, li gor wan encaman, şêleke nuh bidin xwe.


M. Bextiyar

Mehmet Hamidanoglu
(12/9/1952-12/8/1993)

Tu li ber dergehên xewna me wek pasvanekî hişyar rawestiyabû. Yeka yeka xatir ji hilatîna rojê, bi matmayîn, dixwestin... Tu jî destê xwe yê nerm û pakdar ji nav destên me yên lerezok û westiyayî ber bi dilovanîya gorê ve radikişînî.

Mahmut Pakdemir
Kutbettin Aliş
Şefik Öncü
Rociwan Yeşil


Mahmut Kiper
Haydar Otlu
Husametîn Aslan
M. Ali Yıldırım



Mehmet Hamidanoglu


X a c e p i t s

Amadekar: S. Rêving



veke gazîkirinê (bereva-ji) 3-a- Mêrê xuşka mi-rov b- Madeya kîmyayî ya ku jê atomê çêdikin. 4-a- Navê gelekî ku li Îranê dijî. b- Xezal, cey-lan. c- Herfa "m" têkeve dawiyê dibe "rim" 5-a- Cihê bilind, lê ne çiya, mitik (berevajî) b- Renî, dema ku zivîsyanê berf ji cihên bilind gindir dibe û berê xwe dide jêr. c- Ne germ 6-a-Çima, ji bo çî (berevajî) b- Ne nêr 7-a- Mamîrk, zîxan. b- Kralîçe (berevajî) 8-a- Li Kurdistanê bakur qe-zayek ku dikeve navbe-ra Pasûr, Farqîn û He-zoyê de. b- Darê pir qayim ku birîna wê ge-lek zehmet e. 9-a- Sem-bola navnetewî ya Tir-kiyê b- Hinarok 10-a- Sala bihûrî b- Nexwe-şiyek c- Daxwaz kirin, xwestin 11-a- Li Kurdis-tana başûr, li Behdînan bajarek b- Miletên ku ji Qewmê arî ne (berevajî) 12-a- Aletekî muzîkê b- Pozîtîf, musbet (bere-vajî)

Bersiva hejmara berê



ÇEPERAST: 1-a- Paşnavê kurdnasê cuhû yê binavûdeng. Li Rûsyayê diji û "Pîrsa Kurd 1891-1917" yek ji pirtûkên wî yên navdar e. b- Cihê ji laşê mirov (berevajî) 2-a- Nex-weşiya "Verem". b- Karê paqijkirina giyayê biyanî yê di nav neba-tên çandî de. 3-a- Nex-weşiya ku dikare ji yekî derbasî mirovên din bibe. b- Di navbera Şîrnex û Sêrtê de qe-zayeke Kurdan.

4-a- Derd, elem, kulûkovan b- Kesê jîr, laş bi hêz. c- Şert, merc, 2 sebeb 2. 5-a- Sînonîmeke "ne, na" b- Kar, şuxil. c- Li hinek deveran ji "potatis" ê re dibêjin, petat. 6-a-Ne dereng b- vexwarina serekî c- pîrsek (bere-vajî) 7-a-Meyek, vex-

warînek b- "Deryayên" biçûkî ku ava wan na-herike. 8-a- Rojname yan kovara ku mehê carekê derdikeve, yek-mehî (berevajî) b- orte, ne biçûk, ne mezin. 9-a- Ne kevin b- kesê ne sax, kesê najî. 10-a- baneşanek b- "nexêr", na. c- Dilber, xweştir. 11-a- Di bawerîya Zerdeştî de Xwedayê qencî û başî ye. 12-a- Gundiyê bêerd b- Navê rojeke heftiyê (berevajî)

SEREJÊR: 1-a- Karê kelandina sewze û bi vî awayî çêkirina xwarinê, kelandin. (Li devera Behdînan tê bi kar anîn) b- Ne roj c- Mam, birayê bavê mirov 2-a- Cihê ku lê genim dihêrin b- Cihê ku koçer havîna diçine, cihê giya û çereya xweş. c- pey-

Kultur û Qabiliyet

Riza Polat

RASTÎYA LAÎSÎZMA MUSTEFA KEMAL

Piştî bûyera Sîwasê careke din diyar bû ku di pîrsa Îslamî de tevgera Kurd û Tirk a pêşverû hê ji bi bin tesîra Kemalîzmê xelas nebûye. Helwesta wan ya li hember bûyera Sîwasê li ser mgotinên qalib û analizên serve-serve hatibû avakirin.

Di şertên Tirkîyê de qebûlkirina gotina laîkî ji mirovî re hinekî giran tê. Mustafa Kemal naveroka laîsîzmê vala kiriye. Di bin gotina laîkbûnê de qetlîamên Kurdistanê, kuştina demokrasiyê û tasfiyekirina muxalefeta li dij Mustafa Kemal heye. Lewra, dema li Tirkîyê behsa laîsîzmê tê kirin, pêwîst e mirov ferqa di navbera helwesta xwe û ya Kemalîstan de ronî bike. Lê mixabin di bûyera Sîwasê de tu hêz û rewşenbîrek Kurda ferqa di navbera xwe û Kemalîstan de neda xuya kirin.

Heta nûha hê çu dirokna îspat nekiriye ku dema Mustafa Kemal dest bi tevgera xwe kiriye, laîsîzm parastîye û baweriya wî bi laîsîzmê hatiye. Di program û sloganên Mustafa Kemal de laîsîzm tunebû, çûnkî wî xelîfetî diparast. Di 1920'î de, li Enqerê meclis danî, lê di 1924'an de xelîfetî bi zora Îngilîza rakir û cumhuriyet îlan kir. Di rakirina xelîfetiyê û guherandina paytext de roleke Îngilîzan ya bîngehîn hebû. Wê demê li herêmên Ereban, Hindistan, Pakistan û Afrikayê nufûzeke xurt a Îngilîzan hebû. Ji ber wê jî Îngilîzan merkezeke dînî, bi însiyatîf û dezgeheke ku cihana Îslamî bi biryar û bi fetwayên xwe biherikîne, nedixwestin. Îstêbol û xelîfetî di jiyana musulmanan a manewî de du faktorên giring bûn û Îngilîzan ji xwe re xeter diditin.

Di dema Mustafa Kemal û diktatoriya wî de gotina laîsîzmê her tim li ser serê tevgera Kurd a azadîxwaz û tevgera Tirkan a demokratîxwaz wek şûrê Demokles hatiye bikaranîn. Li Tirkîyê û li Kurdistanê her çî pêşveçûnek û liveke ku dijî Mustafa Kemal rû dabe, bi propaganda laîsîzmê hatiye perçiqandin. Tu dirokna heta nûha îspat nekiriye ku Kurd ji bona ku xelîfetiyê paşde bînin serî hildane. Lê di wî warî de dawîya propagandê û iftirayên Kemalîstan nehatiye.

Tevayîya ronakbîrên Tirkan û bîrek rewşenbîrên Kurd ehemîyetê mezin didin 'reformên' Mustafa Kemal. Guherandina herfa, rakirina fes, li cem hinek ronakbîrên Kurd û Tirk wek gavên dîrokî tînin hesabandin. Pir nivîskarên xerib bi propaganda Kemalîstan xapiyane, kitêp û tez di derheqê wan 'reforman' de amade kirine. Lê îro dunya û insanîyet baş dikare bibîne ku pêşveçûna ilim, teknoloji û a fikrî ne di herfan de û ne ji di guherandina cil û bergan de ye.

Kurd di pîrsa dînî de pêwîst e ji herkesî pirtir hesas bin. Çimkî giraniya tevgera Kurd a azadîxwaz a sedsala me, di bin serokatiya şêx, seyîd û dîndarên Kurd de rû daye. Di bîngeh û destpêka tevgera Kurdî a millî de rola melle û alimên dîndar roleke esasî bû. Heta mirov dikare bibêje, çî di teorî û çî di pratîkê de, di pêşketin û gurkirina ruh û hîsên millî yên netewa Kurdî de melle,

şêx û seyîdên Kurdan roleke giran listine.

Kurdan Îslamîyeyî dereng qebûl kir, lê di pêşketin û îzahkirina dînê Îslamîyeyî de alimên Kurdan ciyekî bîngehîn in. Mamostayê Fatih Sultan Mehmet Melle Goranî (Guranî) Kurd bû. Melle Goranî muftiyê Îstêbolê bû. Wê demê muftiyê Îstêbolê Şêx-ul Îslamîyê Împaratoriya Osmaniyan bû. Li Hindistan, Endonezya û herêmên Ereban alimên Kurdan xwedî otorîte bûn. Li Erebiştana Suudiyê di xurtkirin û belavkirina terîqeta Qadiriyan de rola alimên Kurda pîr e. Ji 1630'î heta 1690'î muftiyê Medîne Îbrahîm Hesenî Kuran bû. Îbrahîm Hesen Kuran di eynî demê de mezinê terîqeta Qadiriya bû. Said Botî îro hem li Suriyê û hem jî di nav cihana Îslamî de wek alimê otorîte tê hesibandin.

Li Kurdistanê di serhildan û tevgerên Kurdan de dijîtiya mezheb û terîqeta her tim zerer daye pêşketin û fikra neteweyî. Di pîr kêm serhildanên Kurdan de yekîti û hevkarî di navbera mezheb û terîqatan de çêbûye. Di serhildana Şêx Mahmudê Berzenci de, birê Melle Mustafa Barzanî Şêx Ahmed dijî serhildanê bû. Çûnkî malbata Berzenciyan mensubên terîqeta Qadiriyan in û malbata Barzanîya jî mensubên terîqeta Neqşibendiyan in. Ji malbata Berzenciya Şêx Berzenci piştî Şêx Ewduqladîrê Geylanî di nav terîqeta Qadiriya de şêxê herî mezin e. Mirov dikare bibêje ku ne faktoreke bîngehîn be jî, di jayetiya di navbera PDK-Îraqê û a YNK'ê de rola terîqeta Neqşibendiyan û Qadiriyan heye.

Ji ber van sedeman, bona ku ronakbîr û siyasiyên Kurd bikaribin politikayên rast û di cî de biafirin, pêwîst e bi kûrayî li ser pîrgirêkên dînî, mezhebî û terîqetên civata Kurd bisekinin û encaman jê derxin. Wexta mirov li arşivên dewleta Tirkan dinêre mirov dibîne ku wan ehemîyetek mezin dane daku derheqê dîn, mezheb û terîqatên li Kurdistanê bibin xwedî înfomasyon. Di diroka Kurdan de dijmînen wan her tim cihêbûna mezheb û dînên li Kurdistanê bikaranîne û Kurd bera hev dane.


Bûyera Sîwasê ne dijmîniya di navbera mezheb û terîqatan a yekem e. Di nav van bîst salên dawîn de, bi dest û nifaqa dewleta Tirk li Melatya û li Meraşê qetlîamên mezin di navbera sunnî û elewîyan de rû dan. Rewşenbîrên Kurd nikarin di dijyatiya di navbera terîqatan de alîgir bin. Rast e elewîti jî destpêka Împaratoriya Osmaniya heta dawîya Împaratoriye her tim di bin zilmê de maye û zulum lê hatiye kirin. Her tim şêx-ul Îslam ji mezhebê sunnî bûye. Îro jî li Tirkîyê Wezareta Dîyanetê li ser hîmên sunnîtiyê ava bûye. Lê ev yek nayê wê maneyê ku îro hêzên siyasî û rewşenbîrên Kurd piştigirî û alîkariya mezhebekê bikin. Eger piştigiriyek weha bête kirin, ne dîr e ku li Kurdistanê wek Libnan û Afganistanê li ser esasê mezheb û terîqatan hêzên siyasî çêbibin. Bê şik rewşek weha dê li welat roleke xirab û tixirkerî bilîze.

BEROŞ



Mahmûd Lewendî

Navê Min Mihemed e!



Serê sibê zû saet 6, balafira me li balafirgeha Şamê daket. Em ji balafirê peyabûn hatin cihê pas-kontrolê.

Ji ber ku sibe bû, piraniya polis û memûrên paskontrolê ji xwe re li ser text û sedirên balafirxanê razabûn. Tenê du polis şîyar bûn. Û kontrola paseportan dikirin. Em çar heval hatin ber kontrolê. Pêşî min pasaporta xwe da polis, demeke dîr û dirêj li pasaporta min nihêrt, li min nihêrt, li hevalê xwe nihêrt, dîsa li pasaportê nihêrt û dîsa li min nihêrt û bi îngilîziyeke erebkî pirsî:

-Navê te çi ye?

-Mahmûd.

-Bo çi li vêderê Muhemmed e?

-Na, Mahmûd e!

-Na, Muhemmed e!

-Na, Mahmûd e, lê bi alfaba Tirkî hatiye nivîsîn û Tirk jî wek tu dibînî "Mahmut" dinivîsin, ji ber wê ye belkî tu welê dibînî.

-Na, na, ne welê ye, li vê derê Muhemmed hatiye nivîsîn!

-Na, babo, welleh na, Mahmûd e! Ma ez bi navê xwe za-

nîm yan tu?

Neyse, ez serê we neêşînim, "na Mahmûd e", "na Muhemmed e", min nihêrt ku emê nexin serê hev û serê hev biêşînin, min got "baş e babo, de bila wekî te be, bila Muhemmed be". Îcar got:

-Na, madem Muhemmed e, te çima got Mahmud, ma qey tu bi navê xwe nizanî?

Ohoo! De îcar were ji vî belayî xelas be! Neyse, hevalekî ku berê rastî bûyerên weha hatiye, yanê xwedî tecrube, xwe di berra kir û bi Kurdî got "Mahmûd 10 dolara bidê tamam e!". Polêsê Erebi Kurdî fam nekir, lê dolar fam kir. Bi dengê dolarê re nûr ket ruyê wî û veciniqî. Û li min nihêrt wekî ku bibêje "bi ya hevalê xwe bike". Min jî bi ya hevalê xwe kir. Bi deh dolaran ez ji navê Muhemmed xelas bûm.

Çavê Xwe Derxe!

Çavê mêrikê gundî pir diêşe. Diçe cem Meleyê Meşhûr û dibêje:

-Eman hewar Mele, ez ketime bextê te, ji do êvar de yeçavê min diêşe, ez nizanîm çî bikim!

Mele:

-Welleh birako ez ji nizanîm çî bibêjim, lê par diranê min pir diêşîya, min çû kişand ez jê xelas bûm, bi min tu jî here çavê xwe derxe ji wê êşê xelas be!



ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

Di garana filan de ne filê nêr, lê fila me serî dikşîne. Jiyana filan ji aliyê avakirina ailê û eşîrî ve dişibe insanan. Aila piçûktirîn ji mak û çêlên wê pêk tê. Ji eynî mak, du-sê aile tînin cem hev eşîrek ava dikin.

Porê mirovî ne tenê ji extiyarî sipî dibe. Por ji tirs, ji tirs giran (saw, xof) û stresa psikolojîk jî sipî dibe.

Hejmara telefonên li bajarê Newyorkê ji her derê zêdetir e; 6 000 000 telefon.

Firokeya Lockheed SR-71 bi leza xwe ya 3530 km/s (di seetê de 3530 km) li dinê bi leztirîn firoke ye.

Li DYA mejiyekî nû yê datayê hatiye afirandinê. Xezîna bêjeyên (gotin, kelime) vî mejiyî ji 4000 bêjeyan pêk tê. Li gor sistemen ku berê dihatin bi karanîna telefûza mirov roleke giring dileyist. Lê li gor sistema nûh telefûza insan hîç tesîr li fêmkirina mejiyê datayê nake. Ev mejiyê nû ne tenê tiştên ku tînin gotin, fêmkirina dîke, bêje ji bo çî babetê hatiye bikaranînê jî derdikeve holê û di cama xwe de dinivîsîne.

Bi kamera tîrêjên infra sor jiyana mirov tê xilaskirin. Tîrêjên infra sor dikarin hemû germiyên di tebîetê de bipîvin û germî ji hev cûda bike. Bi vî kamerayê mirov wê bikaribe şopa insanên ku di erdhêjandinê de li bin xaniyan de mane, derxe û wan xelas bike.

Di nav çûk û teyran de xwediyê dirêjtirîn perî (purt, per, perik) dikê Japonî Onagadorî ye. Rekora dirêjahiya perê vî dikê 10,6 m. ye.